

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

# bîrnebûn

hejmar 77 | 2020



Folkhälsomyndigheten

*Xwe û kesên din ji vegirtin û  
belavkirina nexweşiyê biparêze*

Mem Xelikan  
*Kilamên me*

Abdulbaki Xalîşinan  
*Xalîşinan (Odabaşı) - Yunak/Konya*

S. Erdem  
*Çend minak ji gotinên pêşyan*

Dokument: *Diroka kurdan a sedsalan li wilayeta Helebê*  
ji wergera Dr. Ekrem Önen

# bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB  
hejmar 77 | 2020

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

**Koma hevkarên vê hejmarê**

Ali Çiftçi, Abdalbaki Xalisînan, Fatos Koyuncuer  
Brunner, S. Erdem, Dr Mikaili, Seyfi Doğan, Gurdo,  
Mûlla Evîndar, Ecevit Yıldırım, Mem Xelikan,  
Nuh Ateş, Xalit Temli, Dr. Ekrem Önen, Adem  
Özgür, ÎhsanTürkmen, Mehtab Îdeli, Xizan Şilan,  
Mîr Remê Hêlkeçik, Hızır Akbina, Servet Xelikani

**Adress**

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

**E-post**

info@apetryck.se

**Internet:**

www.birnebun.eu

**Belavkirin / Distribution:**

Ewropa: Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

**Türkiye**

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

**Biha/Pris:**

Europa: 5 Euro

Türkiye: 10 TL

**Abone ji bo du salan**

Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

**Numra kontoya li Swêdê:**

(Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

**BIC/SWIFT: DABASESX**

**IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874**

Çap / Baski: Apec-Tryck AB



*Barbarîya dewleta tirkal... Ev resim û sedan wek vî wênayê divê kurd ji bir nekin!  
Mihemedê Rojavayî yê 13 salî ku di kîmyabarana hawayî ya dewleta tirkal ya di  
payîza navîn a 2019an li Rojava pêkani de canê xwe şewitibû.  
Bi alîkarîya birêz Mesud Berzani li Fransayê tedawi bû.*

**Wênayê berga pêşîn:**

Deriyê jiyane, Bekir Dari

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tîn,  
serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan  
nayên vegeandî.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

## Naverok

|                                                                                           |    |
|-------------------------------------------------------------------------------------------|----|
| Ali Çiftçi, <i>Ji birnebûnê</i> .....                                                     | 4  |
| Haci Erdoxan, <i>Rıza Baran, jiyaneka bi rûmet ji Anatoliya Navîn heta Almaniyayê</i> ... | 6  |
| <i>Xawê û kesên din ji vegirtin û belavkirinanexweşiyê biparêze</i> .....                 | 9  |
| Ali Çiftçi, <i>Keçika pêncsalî li ber qijeqija tavê bi zincîrê hatibû girêdan</i> .....   | 13 |
| Seyfi Doğan, <i>Keça êzîdî</i> .....                                                      | 15 |
| Mem Xelikan, <i>Kilamên me -IV</i> .....                                                  | 16 |
| Gurdo, <i>Gawestî kî ne? Ji ku hatin? Û ku de naçin?</i> .....                            | 18 |
| Xizan Şîlan, <i>Helbestvan</i> .....                                                      | 23 |
| Îhsan Türkmen, <i>Colo -3</i> .....                                                       | 24 |
| Adem Özgür, <i>Şeveke koronayê</i> .....                                                  | 28 |
| Servet Xelikanî, <i>Ziman</i> .....                                                       | 29 |
| Nuh Ateş, <i>Ji vir û ji wê -Çend kurtenivîs-</i> .....                                   | 30 |
| Fatos Koyuncuer-Brunner, <i>Lîstikên zarokatiya me</i> .....                              | 32 |
| Mehtap Îdelî, <i>Lorînek ji bo Dersimê</i> .....                                          | 34 |
| Xalit Temlî, <i>Xewnên gerok...!</i> .....                                                | 36 |
| S. Erdem, <i>Çend mînak ji gotinên pêşîyan...</i> , .....                                 | 37 |
| Mem Xelikan, <i>Quling</i> .....                                                          | 40 |
| Mûlla Evîndar, <i>Evdal</i> .....                                                         | 41 |
| Dr. Ekrem Önen, <i>Diroka kurdan a sedsalan li wîlayeta Helebê</i> .....                  | 43 |
| Mîr Remê Hêlkeçik, <i>Bêje bêje</i> .....                                                 | 58 |
| Abdulbaki Xalîsînan, <i>Xalîsînan (Odabaşî)- Yunak/Konya</i> .....                        | 59 |
| Seyfi Doğan, <i>Qerfê</i> .....                                                           | 67 |
| Ecevit Yıldırım, <i>Nêrînek ji Celîkan li peyvên magî, lur û hur</i> .....                | 68 |
| Nuh Ateş, <i>Muzîkvanên Bremenê</i> .....                                                 | 72 |
| Hızır Akbîna, <i>Pêkenok</i> .....                                                        | 76 |
| Seyfi Doğan, <i>Quto</i> .....                                                            | 77 |
| Seyfi Doğan, <i>Çend gotin û peyv</i> .....                                               | 77 |

## Ji bîrnebûnê

Em di demeka veng awarte de dijîn ku li cîhanê pîrsgîrêkên girseyî çêdibin û bîlez mezin dibin. Ev pîrsgîrêk jî bi hêsanî nayêne sererastkirin.

Rêxistinên navnetewî yên wek YN, WHO (*Rêxistina Tenduristîyê ya Cîhanê*), dewlet, rêxistinên civakî yên medenî, hukûmet û ti ferdek bi serê xwe nikare van pîrsgîrêkên ku bi girseyî rû didin çareser bikin. Ev rûdanên dijwar ên cîhanê hewcedarî bi xebat hevkarîyên musterekek heye.

Li hember pandemîya wek sava COVID-19an lazim e cîhan tevbigere. Bi derketina vê vîrusa koronayê, ku li seranserê cîhanê belav bûye, bi hestên neyînî li hemû welatan bando-reka mezin kiriye.

Li gor agahdarîyên WHOyê ya ku dema ev nivîs dihat nivîsandin li cîhanê zêdetirî 4 126 890 kes bi koronayê ketine û zêdetirî 280 986 kes jî mirine. Yên jî vê nexweşîyê xweşbûyî jî 1 453 387 kes in.

Wekî yekem welatê ku bi vê krîzê re rû bi rû bû, li Çînê gelek ezmûn, nimûne hene ku civaka navneteweyî dikare jê fêr bibe û bicîh bîne. Bi rastî, ji bo kontrolkirina berbiçav û têkbirina vê vîrûsê, hevkarîya navneteweyî pêdivîyek e. Li hem-

ber vê vîrûsê li seranserê cîhanê her welatekî li gor şert û mercên xwe hinek bîryar girtin. Pîranîya welatên asyayî ji ber tercubeyên xwe yên berê di wextê de tedbîrên xwe girtin û ji ber wê jî bi qasî hinek welatên Ewropayê wek Îtalya, Fransa û Spanyayê ev vîrus belav nebû. Mixabin li Îranê, Turkîyê û pîranîya welatên Ewropayê ev vîrus bîlez belav bû û bi hezaran însan, pîranîya wan salmezin telef bûn, hîn jî veng here dê gelek însan bi vê savê bimirin.

Li welêt û li derveyî welêt jî pîr însanên me yên ji Anatolîya Navîn jî ji ber vê sava COVID-19an ji nav me bê xatir xwestin, bêyî seremonîyên şîn û serxweşîyan binax bûn.

Bi taybetî li welatên Ewropayê pîranîya kurdên ku ji ber koronayê mirin penaberên siyasî yên welatparêz bûn. Bi hesreta welêt bêyî xatirxwestin ji nav me bar kirin!... Bila serê malbatên wan û gelê me sax be!

Mixabin di dîrokê de em dibînin di demên veng ên awarte û dijwar de herdem hukûmdarîyên dîktator rewşê ji bo xwe bi kar tînin. Niha li welêt jî rewş hîn zêde diwartir bûye. Bi taybetî ji alîyê aborîyê de. Li welêt xelk ji koronayê pirtir ji ber rewşa aborîya xwe di metirsîyeka mezin de ye. Xîzanî, bêkarî roj bi roj zêdetir dibe.

Em hêvî dikin di demeka nêz de çareserî û aşîya ji bo koronayê bê peydakirin û însan ji vê metirsîyê xilas bibin. Di dîrokê de ev ne cara yekem e ku ji ber saveka wek koronayê însan telef dibin. Savên ji vîya diwartir bûne sebeba mirinên girseyî ku li hinek welatan ji çaran yek însan telef bûne. Niha rewşa dunyayê ne wek berê ye, ji bo ku rê li ber nexwaşîya koronayê bigrên hinek tedbîr, pêşnîyar û he- ta qedexa ji alîyê hukumetan ve tênê kirin. Bala xwe bidin ev kesên ku ji nexwaşîya koronayê xweş bûne nêzikî %40 in.

Xwendevanên birûmet, dema me ev hejmara amade dikir, ji kurdên me yên Anatoliyê Riza Baran ji ber nexwaşîyeka dîrûdirêj wefak kir. Hecî Erdoxan bi sernivîsa *Riza Baran, jîyaneka bi rûmet ji Anatoliya Navîn beta Almanyayê* gotarek li ser Riza Baran nivîsîye.

Agahdarîya Daîreya Tenduristîya Gel a Swêdê ji bo xelk xwe ji koronoya biparêze bi sernivîsa *Xwe û kesên din ji vegirtin û belavkirina nexweşîyê biparêze* bi kurmacî hatiye weşandin.

Di dawîya bihara navîn de li Almanyayê daweyeka ji bo me kurdan pir girîng dest pê kir. Ev cara yekemîn e ku kesek ji bo berpirsîyarekî jenosîda li dijî kurdên êzîdî tê mehkemekirin

ku di salên 2014-2015 an de ji alîyê DÎ (Dewlata Îslamî) ve pêk hatibû. Bi sernivîsa *Keçika pêncsalî li ber qijeqija tavê bi zincîrê hatibû girêdan* li ser wê bûyerê gotarek hatiye nivîsîn.

Mem Xelîkan bi sernivîsa *Kilamên me, Gurdo Gawestî kî ne ê ji ku hatine ...*, Xizan Şîlan *Helbestvan*, Îhsan Tûrkmen *Colo:3*, Adem Özgür *Şeveka koronayê*, Servet Xelîkanî *Ziman*, Nuh Ateş *Ji vir û ji wê çend kurtenivîs û Muzîkvanên Bremenê*, Fatoş Koyuncuer-Brunner *Lîstikên zaroktîya me*, Mehtap Îdelî *Lorînek ji bo Dersîmê*, Xalit Temli *Xewnên gerok...!*, S. Erdem *Çend mînak ji gotinên pêşîyan yên kurdan bi naveroka felsefî û zanistî*, Mûlla Evîndar çîrokek bi navê *Evdal*, Dr Ekrem Önen dokumeteka bi navê *Dîroka kurdan a sedsalan li wîlayeta Helebê*, ji rûsî wergerandîye.

Abdûlbakî Xalîsînan *Xalîsînan (Odabaşî)- Yunak/Konya*, Hızır Akbîna *Pêkenok*, Ecevit Yıldırım *Nêrînek ji Celîkan li peyvên magî, lur û lur*, Seyfî Doğan *Qerfê, Quto û Çend gotin û peyv* ev hejmara bi van sernivîsên xwe dewlementir kirine.

Bi hêvîya ku em giştik xwe û kesên din ji vegirtin û belavkirina nexweşîya koronayê biparêzin bimînin di xêr û xwaşîyê de!

Ali Çiftçî

**Rıza Baran,**

*jîyaneka bi rûmet ji Anatolîya Navîn heta Almaniyayê*

### **Haci Erdoxan**

Rıza Baran di sala 1942an li gundê Tabura, girêdayî bajare Kirşehirê, li Anatolîya Navîn ji dayik bû. Rewşa malbata wan baş bû. Bavê wî di nav kurdên Kirşehirê, Konya û Ankarayê de dihate nasîn. Ew ji malbateka axa bû. Ji alîyê jina de bi kurdên Bala û Konyayê va merive hev bûn. Ji mala Torina jî jin wek bûk dabûn hev. Yanê ew ji malbateka mezin dihat. Malbata wan û bavî wî di dema xwe de tîcarata pêz dikirin. Keriyên wan hebûn. Kek Rıza digot; “Dema bavê min keriyên pêz dibirin Stenbûlê ku bifroşe, ez jî çend caran pê re çû bûm. Li Stenbûlê kesên bi bavî min re hevaltî û tîcaret dikirin, kurdên Kurdîstanê bûn. Wan hemûya bi hev ra bi kurdî dengdikirin. Wê bala min pir dikişand. Wê demê min hêdî hêdî li ser nasnameya xwe, yanî li ser kurdîtiya xwe difikirîm.”

“Dema bavê min got, tu biçe bajêr bixwîne, ez çûm Kirşehirê. Erê wê demê yanî li salên 48-50î tu kurdan nedixwand. Bajar di de-

stê tirka de bû. Kurdên me jî hemû li çolê bûn. Ê xwandevan kes tune bû. Hêdî hêdî miletê me jî dest bi xwandine dikir. Ez, birayê min Hecî, ji Tosunburnê Cemal Beydoxan, ji gundê Çevirme Mehmet Canpolat û dûwa ji gundê Zekerê Kemal İlhan, ji Çevirmê Mistefayê mala Alîm (Mustafa Dönder), ji Serekê Kadîr Tan (xale min e) û ji gundê Çamelê (Çamalak) hinek xort hatin Kirşehirê û dest bi xwandinê kirin. Li wir me dest bi kurdîtiyê kir.” digot Apê Rıza.

Di wê demê de tekilîya xwe bi kurdên Kurdîstanê re jî destpê dike. Bi apê Musa Anter, Yaşar Kaya û yê di doza 49da hatibûn girtin re. Wan ji ber van tekilîyan li Anatolîya Navîn civîn çedikirine. Carekê bi rahmetî Cemal Beydoxan, Kemal İlhan û çend hevalên din va li mala Alîm Xoce li Çevirmê civîn çêkirine. Dema van bîranînên xwe tanîn ziman wek xortekî heycanekê pê digirt.

Apê Rıza di sala 1963an de ji bo xwandinê te Elmanyayê. Li



welat edresa Şêx Nizametîn Kaya didin wî. “Biçe cem vî ew kurdekî ji Agirîyê ye û welatparêz e û li Almanyaya kurdekî rewşenbîr û pêşketî ye” jê re dibêjin. Ew tê bajarê Mûnîhê. Diçe cem N. Kaya û bi rêya wî tekiliyên xwe bi kurdên li Almaniyayê re çêdibin.

Apê Rîza dest bi zanîngeha muhendîsîyê dike. Di wê demê da birayê xwe Hecî jî te ba. Li wir zanîngehê xelas dike. Di salên zanîngehê de di avakirina komela AKSA (Komela Xwandewanên Kurdîstan li Avrupa) da cîh digire. Kurdên ji her çar parçeyên Kurdîstanê nasdike û bi wan re dibe heval û bi we jî pir şad dibe Apê Rîza.

Di salan 1970an de Kemal Burkay û hevalên wî nasdike û di nav avakirina KOMKARê de cîh digire. Di kovarên KOMKARê yê bi almanî de kar dike. Ji alîyê kar de jî wek mamoste li dibistanê kar dike. Pir nivîsên wî li ser penabertîyê û entegrasyonê di kovarên almanî, tirkî û yê kurdî de ten weşandin. Bi karê KOMKARê re jî pir şa dibû. Digot; “Dema li Tirkîye Roja Welat derkeve, ez diçûm dihatim Ankarayê. Dema hejmara yekemîn derket ez ewqes şabûm ku wek ji

şabûnê difirîm. Rojnameyê bi kurdî jî nivîsandî bû.”

Apê Rîza bi çend hevalên xwe û bi dayika Rûkenê va (bi jina xwe va) komalek bi navê IAF: Verband Nationale Familien und Partnerschaften li salên 1970 li bajarê Frankfurtê avakirine. Ew komele niha li hemû Almaniyayê ji bo mehkeme yê malbata û buroya ciwanan terapî û karên taybet çêdike.

Ew di nav almana da jî dihat naskirin û hezkirin. Li Berlînê jî ji sala 1992an heta 1995an wek endamê Partîya Keskane kete meclîsa beledîyê. Di sala 1999an jî wek parlementerekî penaberê yekemîn kete parlamentoya Berlînê. Di nav avakirina Civaka Kurd a li Berlînê cîh girt û serokatîya we kir. Ji 2001an heta 2006an jî serokê meclîsa Kreuzberg û Friedrichshainê bû. Di nav Yekmal a Berlînê de cîhgirtina wî pir giring bû.

Wî di meha cotmeha 2019an de xelata Eyaleta Berlînê ya mezin girt. Bi we jî pir serbilind bû. Piştî xelatgirtinê bi şûn de ji min re telefon kir û wek xortekî şa dibû. Digot; “Ew xelat ji bo kurda ye.” Derdê wî her dem kurd bûn. Dema Seran li Kobane şehîd ket her roj bi telefonê li min digerrî. Mal-


batên wan pir nezikî merive hev bûn. Digot; “Seran rûmeta me ye.”

Digot; “Eslê me ji elewîtîyê tê, min ne li mizgeftê, ne jî li cemxanê rakin.”

Ew rewşenbîr, niviskar û kesekî sêkûler bû. Derdê wî kurd, kur-

mancî û Kurdîstan bû. Car caran digot; “Eger ez bimrim min bibin li hêla Vedat Aydın bi cîh bikin.” Car car digot; “min bibin li rojavayê Kurdîstanê bin ax kin.”

Apê Rıza em te ji bîr nakin. Di nav ronahîyê da be!



### Serxwaşî

**Rıza Baran**, piştî nexwaşîyeka dûr û dirêj li bajarê Berlinê wefat kir. Me welatparêzekî qedirbilind, kurdhez û rûmeta kurdên Anatolîya Navîn wenda kir. Kar û têkoşîna wî ya ji bo mafê kurdan û mirovahîyê dê her di bîra me de bijî...

Em wek redaksiyona Bîrnebûnê li ser navê hemû hevkarên kovarê ji malbata Rıza Baran re serxwaşîyê dixwazin, bila gelê kurd sax be!

*Redaksiyon*





Folkhälsomyndigheten

Skydda dig och andra från  
smittspridning på kurmanji.



## Xwe û kesên din ji vegirtin û belavkirina nexweşiyê biparêze

Li vê derê em gelek şîretên din didin ku mirov çawa xwe ji vegirtina vê nexweşiyê biparêze.

Xwe nêzîkî kesên nexweş neke. Hingê tu hem xwe û hem jî kesên din ji vegirtina nexweşiyê diparêzî.



## Gava nexweş bikevî li malê bimîne

Heger tu xwe nexweş hîs bikî û liça te vekîşe, bikuxî yan te ta girtibe, hingê neçe kar yan medresê. Hingê çî rîsk nîn e ku tu kesên din bi nexweşiya xwe bixî. Heger hindik be jî tu xwe nexweş hîs bikî, divê tu wisa bikî.

Heta nexweşiya te berdewam bike, li malê bimîne. Heger rewşa te xirabtir bibe û tu êdî nikaribî li malê li xwe binerî, hingê bo şîretwergirtina derbareyê nexweşiyê, telefon bo 1177 bike.

Piştî ku tu rehet bûyî, berî ku tu dîsa vegeerî ser karê xwe yan jî vegeerî medreseyê, herî kêr 48 saetan li malê bimîne.

Kesên bi temen dikarin xirabtir nexweş bikevin. Loma grîng e, ku tu serdana kesên nexweş li nexweşxaneyê yan jî li mala âldreboende (salme-

zinan) nekî. Heger karê te sexbêriya salmezinan be, heger tu bikuxî yan jî bapêş bî, gerek e tu neçî kar.

Bila haya te ji symptom'a (nîşan û alameta) nexweşiya covid-19 hebe Symptom'a nexweşiya covid 19, berî her tiştî; ta ye û kux e. Her wisa jî pîrsgirêkên bihnçikandinê, serêş, êşa masil û movikê, symptom'ên normal in. Piraniya kesan bi sivikî nexweş dibin û li nav demekê ev nexweşî bi sexbêriya li malê jixweber diçe û derbas dibe. Hin kes gran nexweş dikevin wek nimûne bi pîrsgirêkên bihnwergirtinê û îltîhaba pişikê. Heger yek ji van symptoman li nik te xuya bike, hingê divê tu bi kesekî din re nedî û nestînî.

### **Destên xwe gelek cara bişo**

Ew maddeyên ku vîrusê belave dike, dikare pir bi hêsanî bi destê mirovan ve bizeliqe. Gava tu bi destê yekî digirî, hingê ew madde ji destê te diçe li destekî din belave dibe. Loma destê xwe gelek caran bi ava germ herî kêr 20 saniye bişo.

Her dem gava tu têtî malê yan gava tu têtî ser karê xwe, diçî derve, berî xwarinê, gava destê xwe didî xwarinê û piştî serdana tûwaletê, destên xwe bişo. Gava tu nikaribî destê xwe bişoyî, destşûştina bi alkolê alternatîfek e.

### **Li nav qermûçeka milê xwe bikuxe û bipişke**

Gava tu dikuxî yan dipişkî, dilopên biçûçik ên bi maddeyên vegirtina nexweşiyê ji dev û pozê te belave dibin, dikare vîrusê ji te belavê kesekî din bike. Bi kuxîn û pişkîna li nav qermûçeka milê xwe, yan li nav destmaleke kaxezê, tu nahêlî ku vegirtina vîrusê nexweşiyê li der û dora te, yan li ser destê te belave bibe. Her dem wê kaxezê bavêje nav qutîka zîblê û destê xwe bişo.

### **Destê xwe nede çav, poz û devê xwe**

Ev vegirtina nexweşiyê bi riya mukoza li nav çav, poz û devî belave dibe. Loma destê xwe nede çav, poz û devê xwe.

### **Alkola destşûştinê**

Gava sabûn û av tunebe, hingê tu dikarî alkohola destşûştinê ya bi kêmanî %60 alkol têde heye bi kar binî.



# Derbareyê Vîrusa Nû ya Corona'yê û nexweşiya Covid 19

Ji meha Çileyê Pêşîn a sala 2019yan vir ve ye, ku ev vîrusa Corona'yê li dunyayê belave dibe. Nexweşiya ku ev vîrus çêdike, jê re dibêjin Covid 19.

## Piraniya kesan bi nexweşiyê sivik dikevin

Xelkê herî bêhtir ku bi vîrûs nexweşiyê dikevin, dikuxin û bi tayê dikevin, bi sivikî nexweş dibin û li nav demekê ev nexweşî jixweber diçe û derbas dibe. Lê hinek kes jî, bi pîrsgirêkên îltihaba pişikê û bihnçikandinê gran nexweş dikevin.

Ev vîrus gava mirov bi tîkiliyeka ji nêzîkî ve bi yekî nexweş re bike, hingê derbasî meriv dibe yan jî gava yekê nexweş li nêzîkî mirov bikuxe yan bipişke derbasî mirov dibe, ku jê re dibêjin droppsmitta (vegirtina bi rîya dilopan).

Symptom (nîşan, elamet) piraniya caran sivik in, neciddî ne û bi piranî nêzîkî pênc roj piştî ku mirov vegirtibe hingê xwe nîşan dide. Lê ev symptom dikarin her wisa hem zûtir ji pênc rojan werin û hem jî piştî pênc rojan.

## Nexweşiya Covid-19, bi yek yan jî çend ji van symptom'an hîsekî giştî yê bêhalbûnê nîşan dide:

- kux
- ta
- bihnçikandin
- liç
- êşa qirîkê
- serêş
- êşa masil û movikê
- dillihavketin.

## Kesên bi temen dikarin xirabtir nexweş bibe

Hin mirov xirabtir nexweş dikevin, wek rast li pîrsgirêkên bihnçikandin û îltihaba pişikê dibin.

Piraniya wan kesên ku bi nexweşiyê xirab dikevin, kesên bi temen ên li ser 80 sala ne. Her wisa jî ew kesên ku xwedî nexweşiyên kronîk (mayinde) yên pişikê ne yan jî ew kesên bi nexweşiya penceşêrê ketine.

## Heft şîretên hêsan ku tu xwe û kesên din biparêzi:

1. Gava tu nexweş bikevî yan bi şeweyêke sivik bi te re nîşanên êşa qirîkê, kux yan vekêşana liçî peyda bibe, hingê li malê bimîne. Piştî tu rehet bûyî herî kêm 48 saetan li malê bimîne.
2. Gelek caran destê xwe bi sabûn û ava germ herî kêm 20 saniye bişo.
3. Gava tu nikaribî destê xwe bişoyî, destê xwe bi alkolê pak bike.
4. Nêzîkî kesên nexweş nebe.
5. Destê xwe nede çav, poz û devê xwe.
6. Li nav qermûçekê milê xwe, yan li nav destmaleke kaxezê bikuxe û bipişke.
7. Ji bîr neke ku gava tu nexweş bî, yan nîşanên nexweşiyê bi te re hebin, hingê serdana kesên salmezî neke.

## Jimareyên telefonê yê grîng

- Bo pîrsên giştî yê derbareyê covid-19 bo: 113 telefon bike.
- Heger tu êdî nikaribî li mala xwe li xwe binerî, bo vî jimareyê telefon bike: 1177. Ji bo şewra nexweşiyê (bi swêdî û inglîzî).
- Li rewşên xetera jîyanê bo vî jimareyê telefon bike: 112.

Agehiya Aktuel  
û bersivên pîrsên hêsan:  
[www.folkhalsomyndigheten.se/covid-19](http://www.folkhalsomyndigheten.se/covid-19)





Folkhälsomyndigheten

# Nehêle derbasî te û kesên din bibe

FOLKHÄLSOMYNDIGHETEN 2020 ARTIKELNUMMER 2023-13 UNIK SÄTTA, KUNMAN ÅR GÅRSEK PRODUKTION ETC KOMMUNIKATION



## Gelek caran destê xwe bişo!

Maddeya vegirtinê bi hêsanî bi destê mirov ve dizeliqe û ji wir dikare li ciyên din belave bibe. Gelek caran destê xwe bi sabûn û ava germ bişo, bi kêmanî 20 saniye. Gava sabûn û av tunebe, hingê dikarî alkola destşûştinê bi kar bînî.



## Li nav qermûçeka milê xwe bikuxe û bipişke!

Heger tu li nav qermûçeka milê xwe yan li nav destmaleke kaxeze bikuxî û bipişkî, hingê tu nahêlî dilopên biçûk ên bi maddeyên vegirtina nexweşiyê li der û dora te belave bibe yan bi destê te ve bizeliqe. Her dem wê kaxeze bavêje nav qutîka ziblê û destê xwe bişo.



## Destê xwe nede çav, poz û devê xwe

Dibe zehmet be ku mirov wisa neke, loma destê xwe gelek caran bi sabûn û avê bişo, da ku van maddeyên têger ji destê xwe pak bikî.



## Gava nexweş bikevî li malê bimîne!

Gava nexweş bî li malê bimîne. Hingê nexweşiya xwe li kesên din nalewitînin.



**Maddeyên vegirtina nexweşiyê li her derên hawîrdora me heye.**

**Pakgirtina destan awayeke herî hêsan e bo parastina te û kesên din ji nexweşiyên.**

**Riya belavekirina vegirtina nexweşiyê ya herî normal, bi destê mirovan çêdibe.**

# Keçika pêncsalî li ber qijejîya tavê bi zincîrê hatibû girêdan

## Ali Çiftçi

Endamekî Dewleta Îslamî (DÎ) yê 37 salî, yê ku mehkemê bi navê *Taha el-J* û hevjinê wê *Jennifer W* bi nav kirine ji bo qirkirin/jenosîda li hember kurdên êzîdî li Almanyayê, li bajarê Frankfurt am Main û Munihê têne mehkemekirin.

*Jennifer W* jineka ciwan a alman ji bajarê Lohne ji dibistana seretayî dûr dikeve û piştî xwe li derûdora hereketên radîkal ên îslamê digrê û bi rêya Turkiyê re xwe digihîne Felucayê. Li wir bi *Taha el-J* re tê zewicandin. Wek endameka aktîv di nav tevgera DÎ a Feluceyê de cih digrê.


Di havîna 2015an de ew jineka êzîdî bi keçika wê ya pênc salî ve wek kole ji bajarê Sîncarê dikirin û dibin Feluceyê, ba xwe.

Dîya keçikê ku mehkemê bi navê *Nour* bi nav kirîye wek şahîdê vî bûyerê anîne Frankfurtê. Li gor îfada dîya keçikê herdûyan, mêr û jinê li keçikê dixistine û ji ber şevê keçikê di xwe de mîz kirîye



Taha el-J dema tînin mehkemê

ev hêrsa mêr anîye. *Taha el-J* radi-be keçikê davê hewşe û bi hesinê pencereyê ve zincîr dike. Keçik li ber germa nêzikî 50 dereceyî, bê av û nan dihêle û keçik li ber qijejîya tavê bi tîna dimire!..



*Nadiya Murad* a ku 20 salîya xwe de dema hêzên DÎ di sala 2014an gundê Koço yê başurê Kurdistanê dorpêç kirin ketibû destê DÎê. *Nadiya* li hember şideta cinsî li ber xwe da. Ji bo vê têkoşînê xelata Nobelê ya Aştiyê ya 2018an wergirt.



*Amal Clooney*, parêzereka bi tercubeyên ji dadgeha Ceza ya Navneteweyî ya li Hagê ye. Ew bi *George Clooney*, yek ji aktorên herî dewlemend ên cihanê re zewicî ye. Di şûna ku jiyaneke luks a bêsînor bijî wê dawa kurdên êzîdî daye ser milên xwe ji bo vê kar dike.

Wênc ji Wikipedia hatine wergirtin.


Di destpêka sala 2014an parêzgeha Reqa ya Sûriyê, her weha bajarê Feluce û di havîna 2014an de jî, duyemîn bajarê herî mezin ê Iraqê, Mûsil, di êrişek çekdarî de ketibûn bin kontrola DÎ. Di dawîya havîna 2014an de deverên kurdan, parêzgeha Nînovayê, pîranîya cih û warên kurdên êzîdî ji aliyê DÎ ve hatibûn bindestkirin.

DÎ bi taybetî kurdên êzîdî ji xwe re hedef girtibûn. Ew wek însanên "nebawer" didîtin û ev yeka di îdeolojîya DÎ de berbiçav e.

Gava ku terorîstên DÎê ketin bajar û gundên êzîdîyan, wan bi hezaran mêr kuştin. Jin, keç û zarokên êzîdî revandin û wek xulam li mintiqên di bin kontrola DÎ de hatin firotin. Her wiha ew rastî destdirêjîyên girseyî û îşkenceya cinsî hatin.

Bi balkêşandina parêzera Brîtanî/Lîbnanî Amal Clooney û Nadia Murad di destpêka payîza 2016an de lêpîrsînek li Neteweyên Yekbûyî (NY) diyar kir ku zordestîya DÎê ya li hember êzîdîyan qirkirinekê pêk tîne.

Ev cara yekemîn e ku kesek ji bo berpirsîyarê jenosîdîya ku li dijî kurdên êzîdî di salên 2014-2015 an de ji aliyê DÎ pêk hatibû



Nadîya Murad bi hevkarîya Amal Clooney serpêhatiya xwe bi navê *Keça dawî; Dilgirtin û tekoşîna min a li dijî DÎ* nivîsiye û ev bi gelek zimanên ewropî hatîye weşandin.

li Almaniyayê têye mehkemekirin. Ev dawa tê payîn ku heta dawîya payîza pêşîn bidome.

Ev armancên li mehkema Frankfurt am Main û Mûnihê li dijî Taha al-J û Jennifer W bê guman pêngaveka berbi rastîyê ve ye û ji bo me kurdan pir girîng e.

Niha hêvîya kurdên êzîdî ev e ku li dijî van qetîlên DÎ mehkemen wek dema nazîzmê ku piştî şerê cîhanê ya duyemîn li Nurnbergê pêk hatin ji bo sûcdarên şer endamên DÎ bîn mehkemekirin.

Hêvîya me ev e ku ev daxwaza Amal Clooney, Nadîya Murad û kurdên me yên êzîdî li bendê ne hêdî hêdî bi cîh bibe pêvajoyeka tewanbarên şer ên Dewleta Îslamî (DÎ) di mehkemeyeka navneteweyî de li dijî DÎ dest pê bike.



## KURTERAST

7 000 jin û keç hatine desteserkirin.

Di havîna 2014 de, DÎ li Sûriye û Iraqê di bin serokatîya Ebû Bekir el-Bexdadî de bi tevgerên xwe yên terorîstî pir pêş ketin, li Surîyê bajarê Raqayê, li Iraqê jî bajarê Mûsilê girtibûn bin kontrola xwe. Bi van pêşketinan ve el-Bexdadî wek serokê DÎ yê herî bilind xwe wek Xalîfe îlan kir.

Di hema salê de mîlîsên DÎ li Sîncarê bi hezarn kurdên êzîdî kuştin û 7 000 keç û jin hatin revandin, îşkence kirin, rastî îşkenceya cinsî û koletîyê hatin.

Di bihara paşîn a 2019an de ev tevgera DÎ a terorîst ji alîyê hêzên SDF bi rêvebirîya kurdan ve hat tékbirin. Hêza DÎ a dawî li bajarê el-Baghuz li başûrê Sûriyê ket destê hêzên SDFê

Xelîfe al-Bexdadî di 27ê payîza navîn 2019an de li Îdlîbê dema hêzên taybet ên amerîkî cîyê wî tespît kiribûn ku bigrên, wî xwe bi bombê întîhar kir.

Ali Çiftçi

## KEÇA ÊZÎDÎ

Seyfî Doğan

ne kata  
ne hekata  
ne jî çîroka  
rasta rasta  
înkara însanîyêtîyê  
min tu bi cam-i cem  
temaşa kirî  
li kevîyê cemî cenetê  
tu yê tî û birçî bûyî  
tîrêjên rojê  
mîna kozîyan agir dibarîn  
porê te şewitî  
xwazîya te zîwa bû  
rêzên adorno hatin bîra min  
hêstêrkên çavên te yê şor  
birinên min şewitandin  
erd û ezman sewî  
barbarên ziman wêran  
hatibûn îştaha hovîtîyê  
agirên rojavayê navîn vemirî bûn  
min kozîyêk nedî ku pêtiyê bi ser dinyê xim  
û doralîyê xwe bibînim  
zincîra stuyê te  
vehşêta dinyêke gemarî nîşan min da  
min kîtêbên hemî dinyê  
avandin tabûtekî  
û da ser rîya goristên  
brûskên şerbaz û şahîd  
tarixê bi bîrkirin nedin

# Kilamên me -IV

## Mem Xelîkan

### Înce Memed

Kilama Sarıkaya ye. Berê, Sarıkaya gundekî girêdayî Cihanbeylîya Konyayê bû. Niha ew gunda girêdayî Kadınhanê ye. Li gund, kurdên canbegî bi cî û war in.

Êş hene ji êşa girantir in. Êşa Înce Memed, êş û jana va kilama bi strandin dayî jî êşeke dilşewat û giran e. Serpêhatîya Înce Memed, meseleke qasî 80-100 sal berê ye. Wek hûn jî dizanin KAN berê piranîya wan pez û heywan xwedî dikirin û debara xwe bi bazirganîya wan dikirin. Pezê xwe ji deşta Konyayê hetanî Stenbolê dibirin bazar dikirin. Çûyîn û hatina wê rêya dirêj ne hêsan bû. Ew peza, çêre bi çêre gund bi gund dibirin Stenbolê. Rêyeke dûr bû. Diz hebûn, şakî hebûn. Li wê rê, pir yoz hatin qirkirin, pir merî hatin kuştin.

Malbata Înce Memed jî, malbateke gund a dewlemend e. Malbateke bi cotkar û şivan e. Bi destê Înce Memed bi bazirganîya pez debara xwe dikirine.

Înce Memed, meriyekî bi dil û bi xatir e. Mezinêkî gund e. Li gund û li gundên cîran meriyekî

hêja û rêzdar e. Li heremê, dost û hevalên wî zêde û bi duristîya xwe dihat naskirin.

Înce Memed rojekê wek berê, bi çend merîyên xwe û şivanên xwe ve, yozê xwe yê pez ji bo firotinê dibe Stenbolê. Pezê xwe bazar dike, perên xwe digire. Ji bo malbata xwe, ji bo dost û hevalan tiştê ku bistînin dikire. Ji bo vegerîna gund amadekarîya xwe dike. Ew dizane li rê diz û şakî hene. Pere li ser zêde ne. Dihere bankayê, pereyên li ser zêde, dixwaze teslimê bankayê bike. Lê li bankayê jê re dibên van perena yê qelp in. Çi dibe, wê demê dibe. Tu yê bi keda xwe ya salekê, bi pereyên wendakirî biêşeyî? Bi navê ku dayînî ser te sextekarî û qelpezanîyê biêşeyî? Dema Înce Memed wê gotinê dihîze, mîna ku qurşîn berdabin serê wî, xwe şaş dike. Şoqê derbas dike. Hişê xwe wenda dike û dîn dibe.

Polîs tîn, dest û pêyên wî kelepçe (sindif) dikin û dibin dikin nexwaşxaneya Mazhar Osman (Nexwaşxaneya Psîkiatri – Nexwaşxaneya dîna). Demekê şûnda mês

dikin ew ji dermanan fêdê nabîne Elezîzê dihere rehmetê.  
 tînin gund. Li gund jî Înce Memed Înce Memed, birayê çar xwanga  
 tu rehet nake. Him malbatê, him jî yê bi tenê bû. Bi ser serpêhatî û  
 cîran û hevalan aciz dike. Bi, ser wê wendakirina Înce Memed û êşa  
 da, demekê li mal bi tenê di odekê xwe ya giran de, ji xwangên wî yekê  
 de digirin. Dûva dibin nexwaşxaneyê va kilama straye.  
 Elezîzê. Di wê nexwaşxaneyê de li

Li xalê Înce Memed sîva hatinê narinê desta  
 Çima nawime qurbane saqê gora û mesta  
 Xalê xelkê ji semûlê anîn tiştê edetê  
 Xalê Înce Memed anîn bi topê kêndirê sindifê desta

Mala bavê min Înce Memed e  
 Were bes e li nav wan dînikana ranemedede

Înce Memed li çola Birikê li çola Birikê  
 Apî Heso te pere rijandin mîna çirikê  
 Dibê Înce Memed heynan birin Qoce Elezîzê  
 Defer nate dînê dibê perî qizê xwe avite qirikê

Mala bavê min Înce Memed e  
 Were bes e li nav wan dînikana ranemedede

Înce Memed payîz hat xelkê xermanê xwe rakirin  
 Xortê malê me elbîsê xwe ye lacîwert li xwe kirin  
 Li nav gund çex bûn tizbyên xwe yên kenebar bakirin  
 Hawar hawar Înce Memed birin teve dînikê Mazhar Osman kirin

Mala bavê min Înce Memed e  
 Were bes e li nav wan dînikana ranemedede.

Çavkanî: Serbilind Kanat

# Gawestî kî ne? Ji ku hatin? Û ku de naçin?

## Gurdo

Min peyva “**Gawestî**”<sup>1</sup> cara yekemîn ji kalikê xwe bihîstibû. Gava ku wî qala eşîra me dikir, wî her carî digot ku: „*Em **Gawestî** ne. Dema ku gayên eşîra me weştiyane, em li wî cîhê sekinîne û em pêş de neçûne û li wir mane. Ji ber ku em li cîhê ku gayên me weştiyan, cîh û war bûne, me ji xwe re ‘**Gawestî**’ gotiye*“.

Min demek dirêj bawer dikir ku ew gotina kalikê min rast e. Ji ber vê yekê min berê digot qey tenê em **Gawestî** ne. Ta ku min ji kesên ji eşîrên din jî ew çîroka “**Gawestîbûnê**” bihîst. Lê xuya bû ku meger li her derê **Gawestî** hene. Ji ber wê yekê jî dijberîyek vekirî derdiket meydana. Nedibû ku em kesên ji eşîrên cûrbecûr hemû “**Gawestî**” bin.

Ji bilî çîroka “**gawestîbûnê**”, min di internetê de hîç zanistîyek rêkûpêk li ser **Gawestîyan** nedît. Di internetê de gelek pirs hene, lê hîç bersivêk tune. Du malperên internetê ku tê de bes pirs li ser **Gawestî** hebûn, lê tê de bersiv tunebûn, min li jêr ji tirkî wergerandiye kurmancî.

Nivîsa yekemîn ya lêkolîner Aso Zagrosî ye<sup>2</sup>. Zagrosî di nivîsa xwe de weha dibêje: „*Ez gelek caran xwe bi xwe waha difikirim, gelo çima di dawîya rêwîtiyê û barkirinê de, gava ku li cîhekî bi cîh dibin, serî li mîto- lojîya (çîroka) „**Gawestî**” yê didin?*“.

Çima eşîreke me, yan jî beşek ji wê bi navê „**Hespestî**” nîne? Her pirsgrêka „**Gawestî**” heye.

Her çiqas ez, ji salan vir ve guftugoyên li ser „**Gawestî**” teqîb dikim, hîna jî ez (li ser peyva **Gawestî**) xwedîyê ramanekê nînim. Her çiqas ku ez, ji guftugoyek ku Canbek û hevalên din gelek salan berê, di “**Kürdistan Forumê**” de li ser vê mijarî kiribûn, gelek tişt elimîm (fêr bûm), dîsa jî min nikaribû wateyekê bidim „**Gawestî**” yan“.

Ma „**Gawestî**” eşîrek e? Ma „**Gawestîyên**” gelek eşîran hene? Ew ji ku tên? Çawa belav bûne? Ez nizanim.

Nivîsa duwemîn jî ji Cemo Dogan<sup>3</sup> tê. Wî jî weha nivîsiye:

„*Ji beşekî Kikîyan re “**Gawestî**” tê gotin. Ji xwe ew peyv bo gelek eşîran jî tê bikaranîn. Ji ber ku ji Berazîyên Elmalîdere ya qezaya Karayazı ya*

<sup>3</sup> Rivayet-ul Kikîyan, ji malpera: [https://cemodogan.com/rivayet\\_ul-kikîyan/](https://cemodogan.com/rivayet_ul-kikîyan/)

*Erzurumê re. Ji Burukîyên Wanê yên ku li ser sînore Iranê dijîn. Ji beşê Hemzebegî yê eşîra Şemsikanîyên Wanê û yên ku li gundên Giran û Bali yê Hizana Bitlisê de dijîn re Gawestî tê gotin.*

### **Kîjan ji wan Gawestîyên rasteqîn in mijara gengeşîyê ye”.**

Ev herdu camêr jî weke min gelek pirsên wan hene, lê bersîvek rêkûpêk li ser Gawestîyan tune. Di nav belgeyên nivîskî de gelek caran qala “**Gawestîyên Mirdêşîyan**” tê kirin. Ew jî ji ber birêz Osman Sabrî tê. Ji ber ku wî di nivîsên xwe yên li ser eşîra Mirdêşîyan de qala “Gawestîyên Mirdêşîyan” jî kiribû.

Pevya Gawestî bi hatina kovara me “**Birnebûnê**” ve ket nav rojeva me *Kurdên Anatolîya Navîn* jî û ji rojeva me êdî derneket. Her kesê ku dabû ser şopa eşîra xwe, berê her tiştî rastî “Gawestîyan” dihat. Nebûna belgeyan wek derdekî giran û ecêb derdiket pêş van kesan.

Weke ku birêz Aso Zagrosî jî dibêje, çima eşîrek bi navê “**Heswestî**” nîne? Min jî her ji xwe re digot çima “ker, hêştir, mîh yan jî bizin” newestiyane, lê **ga** westiyaye? Hem di nav eşîran de “ga” hewqas nedihat xwedî kirin. Lê çima “westîbûna” **gayan** hewqas girîng bû?

### **Eger ga newestiyaye, lê çi westiyaye!**

Di destpêkê de min bawer dikir ku pevya “ga” rast e, lê divê bû ku pevya “westî” ne rast be. Yanî min bes ji rastbûna pevya westî’yê şik dikir. Gava ku ez li ser awayên îhtîmalî yên pevya **westî** difikiriyam, min dît ku awayên îhtîmalî ya pevya **westî** pir nînin. Dibe ku westî ji **bestin**<sup>4</sup>, **gestin**<sup>5</sup>, yan jî ji **mestin**<sup>6</sup> bê. Di Kurmancî de tipên “b”, “m” hinek caran ji „g“ di nav peyvê de diguherin û dibin “v” yan “w”. Ji ber vê yekê awayên îhtîmalî yê **westî** bes ew peyv bûn: **bestin**, **gestin** û **mestin**“.

Minakên guherînên tipên „B“, „M“ û „G“ yê „bi „W (V)“yê ve:

4 Êdî hindik be jî, ew peyv di kurdî de hîna jî tê xebitandin. Ew tê wateya **giredanê**

5 Gez kirin (*ısırmak*)

6 Ez nizanim di kurdî de peyvek weha heya yan tune ye. Wek îhtîmal min ew peyv jî xist nav rêzê.

| Kurdîya kevn |   | Kurdîya navber |   | Kurdîya îro | Guherîna tîpan |
|--------------|---|----------------|---|-------------|----------------|
| Namadar      | → | Navadar        | → | Navdar      | M → V (W)      |
| Baba         | → | Bava           | → | Bav         | B → V (W)      |

Mînakên guherîna tîpa „G“, yê „bi „G” û “C”yê û “K” yê bi “G”yê ve:

| Kurdîya kevn               |   | Kurdîya îro                                   | Guherîna tîpan (herfan) |
|----------------------------|---|-----------------------------------------------|-------------------------|
| Gâh ( <i>Yer, Mekan</i> )  | → | Geh (Gah) <sup>7</sup> , Cîh, Ca <sup>8</sup> | G → G, C                |
| Kav ( <i>Sêr</i> )         | → | Ga ( <i>öküz</i> )                            | K → G                   |
| Gwîl (çiçek)               | → | Gul, Vil                                      | G → W (V)               |
| Giyan ( <i>Hayat-Ruh</i> ) | → | Jiyan, Can                                    | G → J, C                |

Mînakek bo guherîna tîpên b → w (v) yê, em ji nivîsek Fergîn Melîk ji were bidin: “*Di kurdî de “b” û “v, w” tim cî(h) diguherin. Mînak: bibe = bivê; bibêje = bivêje (yan jî biwê); bab=baw*”<sup>9</sup>.

Lê gava min ferq kir ku ji “gestin û mestin” watekî rast dernakeve. Min rasterast bala xwe da peyva “**bestin**”ê (*bağlamak*). Pir li nêzikî aqlê ye ku divê bû “best” guheriye û bûye “**west**”. Ji ber ku tîpa „B” di navbera peyvê (*kelîmê*) de gelek caran diguheriya û dibû „W (V)” Yanê Bestin bû → Westin. Wêcar peyva me „Ga-Westî” bû “**Ga-Bestî**” (*öküzü bağli*). Min gavek pêş de avêtibû, lê pir bi pêş ve neçûbûm. Ha ga *westiyaye* (*yorulmuş*), ha ga *bestiyaye* (*bağlanmış*). Di navbera wateya van herdu peyvan de ferqek mezin tunebû.

Yanî mimkun e ku peyva **Bestin** (*bağlamak*) guheriye bûye **Westin**. Ji ber ku di kurmançî de ji xwe peyvek “westiyan/westin” hebû. Gava ku **bestin** guheriya û bû **westin**, wateyê peyvê ji pê ra guheriya.

Lê ji ber ku di navbera **Gawestî** û **Gabestî** de ferqek mezin tunebû, şik ji dilê min ranebû. Dû piçek din fikirinê, şikek li ser rastbûna peyva „ga” (*öküz*) ket dilê min. Wêcar jî ez li ser îhtîmalên awayên peyva „ga” fikirîm. Min xwe bi xwe pirs kir û got: Divê “Ga” ji kîjan peyva kurdî ya kevn guheriye û bûye „ga” yê **Ga-Bestî**? Guherînên tîpa „G” di kurdî de gelek kêman in. Tîpa “G” dibe → “K”. Yan jî “K” dibe →

<sup>7</sup> Îro di kurdî de ew peyv gelek caran wek paspirtik (bi tirkî sonek) tê bikaranîn û wateya “cîh, şûn û war”ê” dide. Minak: “bingeh, çêregeh, fermangeh, havîngeh û zanîngeh”

<sup>8</sup> Di dimilîkî de tê wateya “cîh”

<sup>9</sup> Fergîn Melîk, *Guhartinên ziman zarave*, kovara *Lêkolîn*, hêjmar 1, sal 1995, rupel 35



“**G**”. Di hinek peyvan de “**G**” naguhere. Di hinek peyvan de jî di bin tesîra Erebi<sup>10</sup> de “**G**” dibe “**C**”. Ji bo mînanan li çarçevyên mînanan yê jor mêze bikin.

Mimkun bu ku “**Ka**” guherî û bû “**Ga**”. Yan jî “**Ga**” nehuheriye û wek xwe maye. Lê ji van herdu guherînên îhtîmalî ji wateyek rêkûpêk derneket.

Wê gavê peyva “**Gah**” (“**Geh**”)<sup>11</sup> hat bîra min û min pirsgrêka **Gawestî** di wê gavê de çareser kir. Yanê îhtîmalek din jî hebû ew jî “**Ga**” neguheriye lê bi ketina tîpa “**h**”yê ve, ji peyva “**Gâh**”<sup>12</sup> tê. Bi ketina “**h**” ve “**Gâ**” paş de maye. Yanê peyvê eslî ne “**Ga**” ye, lê “**Gâh**” (*yer, mekan*) e. Ji ber ku di kurmancî de, ji xwe peyvek “**Ga**” heye. Gava ku “**Gâh**” (*cîh, şûn*) guheriya û bû “**Ga**” (öküz), wateyê peyvê jî pê ra guheriye.

Di bin sîya van mînanan de em niha bi hêsanî dikarin bibêjin ku peyva „**Gawestî** (*bi wateya: öküzü yorulmuş*)“ ji peyva **Gah-bestî** (*bi wateya: yere bağlanmışlar*) hatiye. Divê em bi çavên dapîr û bapîrên xwe yê rewend (*göcebe*) ve li vê peyvê mêze bikin. Rewendiyên ku edî nedikaribûn rewendiyê (*göcebelik*) bikin, xwe bi xakê (erdê) ve girêdayî (*besteyî*) didît. Çîroka rast ya peyva me **Gawestî** jî ew e.

Ew şîroveyê nû hemû pirsan ji holê radike û bersivên hemû pirsan li ser **Gawestîyê** dide.

| Peyva ku me qey digot rast e                      | Awayê peyvê yê navber                   | Peyva herî rast (ya dîrokî)                                                        |
|---------------------------------------------------|-----------------------------------------|------------------------------------------------------------------------------------|
| <b>Gawestî</b> ( <i>öküzü yorulmuş</i> )          | ← <b>Gabestî</b> ( <i>öküzü bağlı</i> ) | ← <b>Gâh-bestî</b><br>( <i>yere bağlı, mukim, iskan edilmiş, göcebe olmayan.</i> ) |
| <b>Ga</b> (“ <i>yer mekan</i> ” guherî bû “öküz”) | ← <b>Gah, Geh</b> ( <i>yer, mekan</i> ) | ← <b>Gâh</b> ( <i>yer, mekan</i> )                                                 |

<sup>10</sup> Di ziman û alfebeya Erebi da herfa (tîpa) “**G** (ge)” tune. Gava ku Erebi jî zimakî din kelîmekî (peyvekî) bigrin û di vê kelîmê de “**G**” hebe. Erebi we “**G**”yê wek “**C**” dixunin û dinivîsin. Mînak: Erebi ji girên “**Golan**” re “**Colan**” dibêjin.

<sup>11</sup> Di Kurdîya kevn de 3 wateyên cuda ya peyva **Gâh** hene. 1. Şûn, Cîh, Cî, Ca 2. Dem, Wext 3. Stran, Goran. Rûpel 34 ya pirtûka N. MacKenzie “**A Concise Pahlavi Dictionary**”.

<sup>12</sup> Li mînaka “**Gâh**” a ku li jor di çarçavê duwemîn de ye mêze bikin.

|                                                |                        |                        |
|------------------------------------------------|------------------------|------------------------|
| <b>Westî</b> (“bağlı” guherî bû<br>“yorulmuş”) | ← <b>Bestî</b> (bağlı) | ← <b>Bestî</b> (bağlı) |
|------------------------------------------------|------------------------|------------------------|

**Gava em peyva dirêj kurt bikin, çîroka “gawestî” ya rast weha ye:**

Bapîr û dapîrên me rewend<sup>13</sup> (*göçebe*) bûn. Wateya hinek peyvên wan giradayî awaya jiyana wan bû. Yanê ew bi xwe rewend<sup>14</sup> bûn û ew bi çavê rewendan (koçeran) ve li jiyane mêze dikiriyan. Wana bi vê fikr û ramanê rewendîyê (koçerîyê) ve peyvên xwe çêkirin. Kesên ku niştecîh bûn (*yerleşik olanlar*) di çavên rewendan de wek kesên ku “giredayî erdê (xakê)” nedihatîn dîtîn. Bo vê yeke jî, rewendan (*göçebeler*) navê “**Gâh-bestî**” li niştecîhan (meskun olanlara) kirin. Yanê ji wana re, yên ku bi **Gahê** (*cîhê*) ve **Bestî** ne (*girêdayî ne*) gotin. Ew peyv di nav dewr û deman de guherî û bû **Gawestî**.

Bê şik di destpêka qedexekirina rewendîyê (*koçerîyê*) de (di salên 1730 de) gelê me wateya rast ya Ga-Westîyê dizanîbû. Ew ji rewendîyê derketîbûn û êdi ew jî bûbûn **Gawestî** (*meskun*). Wana di destpêkê de bê şik ji xwe re “**Em êdî Gawestî ne**” digotin. Ji vê hevokê di nav derbasbûna demê de peyva “êdî” rabû û hevok bû: “**Em Gawestî ne!**..

**Kî ne em? Gawestî em!**

“Ji bo giyana pak ya hemû dapîr û bapîrên me yên ku rewendî bûn”<sup>15</sup>

13 Rewend bi Tirkî tê wateya yûrûyen (meşîn), akan (herikîn), giden (rêwîn) û hareket eden (lîvîn).

14 Peyva kurdî ya rasteqîn bo koçer (göçebe) **rewend** e. Ez ê di hejmarên nu yên kovara me Birnebunê de nivîsek dirêj li ser vê peyvê binivîsim.

15 “*Göçebe olan atalarımızın temiz ruhları için*”

# Helbestvan

## Xizan Şîlan

|                                       |                                          |
|---------------------------------------|------------------------------------------|
| tîreke tûj                            | hunera xwe diafirînin                    |
| li ser dilê helbestvanên keserkêş     | helbestvan                               |
| daçikiya ye                           | hevalcêwîyê ramanên filozofan in         |
| helbestvan                            | bi aqil û mantiq û pêhesînên xwe         |
| di agirê kelkela hesreta sewdayê de   | perdeyên reştarî                         |
| dişewitin                             | vediçirînin                              |
| li baxê hezkirinê                     | li nav hişkebeyaran xezîneyên veşartî    |
| bêhna kulîlkên rengîn                 | derdixin holê                            |
| li derdoran belav dikin               | nêçîrvanê derûnîya peyvên                |
| helbestvan                            | xweşik in                                |
| şervanên sînornenas in                | memosteyên xemla melodîya                |
| çirûskên roja hemdem in               | muzikvanan e                             |
| li nav tofanên har                    | helbestvan                               |
| govenda heqîqetê digêrîn              | şûrê destê wekhevîya jiyana              |
| mîna teyrên baz hêlîna xwe            | azad in                                  |
| li asta zinarên herî bilind ava dikin | dengvedana kûrahîya bîra                 |
| helbestvan                            | ramanê ne                                |
| li nav nazikîya hest û xeyalan        | hevparê şîn û şadîya                     |
| ji kezebê dinalin                     | xwendevanên xwe ne                       |
| bi hostatîya gotinên xweşik û zêrîn   | li dijî neheqîya zaliman                 |
| tevna helbesta xwe dihûnin            | çekên rizgarîyê ne                       |
| di navbera çar diwarên zîndanê de     | leheng û pêşengê civata xwe ne           |
| tova hêviyên pêşerojê direşînin       | helbestvan                               |
| helbestvan                            | li koretariya şevên bêhteng              |
| herika kanîya peyvên zelal û spehî ne | dibin şewqa fînden geş                   |
| ji tasa asîmanê şîn                   | dibin tîreja berbangên ronak             |
| rondikên peşkên baranê                | dibin pênuşa sirên nependî               |
| vedixwin                              | dibin keskesora gewrîya xemkêşan         |
| bi baskên dilê şikestî                | dibin dermanê bîranînên di jana zirav de |
| ber bi asoya zanîne ve                | diperpitin                               |
| difirin                               | û dibin melhema                          |
| li nav pêlên mij û dûmanan            | birîna êşên giyana evîndaran             |

## Îhsan Türkmen

Husîn bi bilçikî dara biyê xwelîya ser sikanê tevlihev dikir, mêriyên ku ji qula di navbera keviran da derdiketin, hêdî hêdî dida alîyekî din. Husîn serê xwe bilind kir û bi çavê xwe yê qir kirî li Colo mêskir. “Min di çêv da anîyo, çav çima qir kiriye?” bi henek Husîn ji Colo ra şor kir. Colo li xwe çû ferqê û xwast herdu çavên xwe veke lê nebû -tava êvarê dida ruyê wî. Balîfa xwe girt û xwe avête ber sîyê, çavên xwe vekirin û got “Eşê, xwangê, ka were, ka kî ji me yî qir e?” Hîke hîka wî bû. Eş wekî ku têngihîştibe, ji aşxanê derket hat li ber wan dawestî, wê jî çavê xwe yê rastê qir kiribû. “Te got çi?” Eş ê ji Colo pirskir. Pişqinî kete Husîn û Colo û wana dest bi ken kirin. Husîn got “lo va yê ji me jî kwîrtir e.” Her sê bi hev ra têra xwe kenîyan. Husîn di Eşê re sere xwe ba kir, wekî ku bêje “tu here îşê me heye.» Eş di cîh têngihîşt û dest avêt sinîya ku qedex û çaydan li ser û berê xwe dîsa da aşxanê.

*Li devera Anatolîya Navîn gava bihar xilas dibe û germa tavê çilka dawîyê ji herdê dikşîne, berê rengê erdê yê qehweyî gewr dibe, paşê li gor bihêzbûna kokan, gîha hêdî hêdî*

can didin û hişk dibin. Xemla kesk û şîn ya xezayê dihere, çîya û banî, bax û baxçe, zevî û mêrg zer dibin, erdê zîvîn jî gewr dibe. Di van rojên havînê de, gava tişkên tavê gihîştin erdê, erd dibiriqe û tesîra xwe li ser dîtina mirovan dike. Gava him ezman û him jî erd *bibiriqe, meriv nikare bi herdu çavên xwe yê vekirî ber xwe bibîne. Divê meriv yan çavekî xwe bigre -bi piranî çavê çepê- yan jî çavên xwe bi nivî bigre.*

Colo deng ne dikir, yan jî nedixwast deng bike. Berê xwe dabû valahîya ber malê û kûr kûr li gir mês dikir. Husîn herçiqas bi sebir bûya jî, ew bêdengîya Colo bi wî bi qar dihat. Ditirsîya ku Colo tişteki xirab kiri be, yan jî tişteki xirab anîbe serê xwe. Ne ew û ne jî Colo rehet bûn. Bi wî halî bîstekê sekinîn. Husîn wekî ku bê hemdê xwe bilçikê dara biyê di piştî Colo kuta û bi dengê hêrs go: “Colo, de bê! Te ez bi hecandim ji meraqa. Çi ye, te kesek kuşt, te dizî kir, te li kesekî xist?” Ji Colo deng dernetiket. „Maka ton gemê. Nabê, mebê, temel xema min e. Bi cehnemê stuyê te va.“ Dîsa bêdeng bû Colo. Husîn bilçikê destê xwe ji sikanê de avête xwarê, hat li

kêleka Colo runişt, destê xwe avête stuyê wî. Wekî ku ji gotinên xwe yên dawî poşman bibe „De rabe em herin ba Mamike, ji xwe ra du şoran bikin!“ Colo hîşk bûbû di şûna xwe da, ne got “erê”, ne got “na”. Bê ku Husîn careke din jê ra bêje, ew ji sikanê berjêr daket, bi gavên biçûk berê xwe da mala Mamike. Tu neçû, Colo jî xwe da pê wî.

“Eow Husîn, ka biskine!” Colo him digot, him jî bi gavên dirêj ketibû pê Husîn. „Mere malê Mamike, em herin ber çem, ez ê hertiştî ji te ra bêjim.“ Bi vê gotina Colo ra Husîn çerx bû li Colo mês kir. Husîn: “De ma weng be! Tu vê carê jî derewan bikî -ku ez dizanim te di sa min bi derewên xwe bibî bînî, ez ê serî te di avê kim.» Pê ra jî di bin simbêla ra kenîya. Colo qebûl kir û herdu hevala berê xwe dane çem. Gava gihîştin çem, heryekî xwe da ser kevirêkî.

Colo ne Coloyê berê bîstekê ber vê bû. Ji xwe bawer bû. Yekî bidîta, wê bigota Colo wê jêpirsîna Husîn bike. Colo di navbera mala Husîn û heta çem da ji xwe ra derewek dîti bû: *Cendirme hatibûn gund li wî digerin ku wî bibin ji bo wezîfeya eskerîyê. Ji xwe esker serî carê dihate gund. Vê carê jî ji bo wî hati bûn. Berî ku ji mala mixtêr derkevin herin mala me, lawê*

*mixtêr yê biçûk, Çetîn, bi lez xeber dabû min û min tavne çiv da. Di paş mala Hesmên, di pişt mizgeftê, di nav malên taxa jor ra xwe avêti bû pişt neqebê. Havîn bû, her kes li ser karê xwe bû, ji ber wê jî ne wî kesek dîti bû, ne jî kesekî ew. Lê paş neqewê jî ne ewle bû. Wira cîhê xermana bû. Heta ku bi şa kirî, rivîya bû. Di ser rêyên bewrar ra, di dawîya dawî da xwe avêti bû Îna Mihî Ūsiv (Hesilmên). Bîstekê li wir bêhna xwe girtî bû. Piştî nîv saetê cemseya eskerî ji susê daket û di ser Nala Pîrkê ra berve şikeftê ajot. Wî zanî bû ku li wî digerîyan. Ji tîrsa ketibû nava şikeftê. Na wira ne ewle bû. Ew ê têteta dehlîzên şikeftê. Ne mimkûn bû ku cendirme têtetana wira. Ew kete wira û wî xwe çend saeta di wir da veşartî bû. Gava ji dehlîzên şikeftê derket, cendirme çûbûn. Wî jî paşê di ser Nala Pîrkê û Text ra xwe avêti bû Girê Qoce, ba destbirakê xwe. Wî dizanî bû ku destbirakî wî, wî bi tenê nahêle, û ew ê bihata hewara wî. Ne destbirakê wî bûya, ewê biçûya ba kê. Kesekî wî tune bû. Ew ê biçûya û xwe teslîmî eskeran bikira.*

Colo derewa xwe careke din di ber çavan ra derbas kir. Her tişt di cîhê xwe da bû, her tişt li hev dihat. Husîn nedikarî bû lê biçûya ferqê. Dibe ku çend mehan bi şunda bihata gund û li wir deke mixtêr yan jî lawê

wî bihata û ji wan pirs bikira. “Teow, heta hîngê Xwadeyî mezin e.” di serê xwe da derbas kir.

Colo ji Husîn ra: “Birango, qe pirs meke, çi hate serê min û çi nehat!” Û dest pê kir derewa xwe ji Husîn ra kat kir. Bi ya Colo, derewa wî dereweke baş bû. “Husîn, de tu were, halûmesela min va ye. Tu bûyayî te yê çi bikira, de bêje! Ez ê çîng herim eskerê? Meleka xwanga min wê çir be? Keçikeke bi tenê, ne dê û ne bav, ez jî tune bîm, ne bira û ne xwang. Xal û ap hene, tu dizanî ew jî li me nabin xwedî. Xwe dane bendê ku, em bimirin û 50-60 donim terlê me yê ku hene ji dest me bigrin. Na birango, ez narim, min bikujîn jî ez narim. Min bibin jî, ez ê serê carê birevim werim.» Ji fêlbazîya Colo bû, an na, hêstirk bi çavên Colo keti bûn.

Husîn bê ku şora wî bibire heta dawîyê guhdarî kir. Niha ji bawer kirina mesela Colo pirtir, serê wî li ser halê wan ê ku ew tê da bûn, xwe bi wê aciz dikir. Colo rast digot. Dilê wî bi wan êşîya. Colo û Melek li vê dinyayê bi tenê. Husîn keserak kişand û destê xwe da ser junîyê Colo. “Pêêê, mimagayî sersivik. Lê ez î va me, Omkî heye, wana jî ne, ev gunda gî ji te hez dike, mîletî bi çerê te ye. Min jî got «ka çi ye, çi hatiye

ser birakê min. Serûbinê xwe jî va bû? Metirsa ez nahêlim ku cendirme te bibin eskerîyê.»

Colo derew pir dikirin. Bixwaze ewê de reqekê de deh derewan bike, kes jî pê nehase. Derewên wê bê zîrar bûn. Ji derewa pirtir qewet li xwe dikirin. Di nav civatê de yekî qala tişteki bikira, çi dibe bila bibe, hema di cîh de lihevdanî û xwe teve meselê dikir. Milet jî pê dikenîya, hinekan jî yek cara qoma wî dişkena. Lê ji xwe ra ne dikire xem. Yek lê hêrs bibûya, dehan jê hez dikir. Carekê çend kes li ber dikana Mihkê, a li ber mizgeftê, çend kes berhev bûbûn qala mesela dikirin. Meselê mesele vedike, şor tê ser kuştina Hemikî Hecî a bi destê cîranê xwe ku belkî 50 salî berî bûyîne Colo qewimîye. Ji ciwatê Alke mesele vekir û got “Erê, kekî min qal dikir. Hemik î serî sibê ji mal derdikeve ku here di ser tereke ra meske. Hîngê di navbera malbavên Hemikê û cîranê wan malê Usiv da niqaşa li ser zevîyan hebûye. Yekî ji mala Ûsiv çend gav ji terleyan mala bavê Hemikê ajotîye. Mala Hemikê diherin mêsdikin ku Xale Ûsiv î terla wan diajoye. Meselê dirêj nekim. Hemikî dîn bûye, gava hêrs diketîye, çav li serî sor dibûne. Ewî digre bi çiftê teve Xale dike û birîndar dike. Xal hema nemir lê,

bi salan ji ber birînen xwe kişand. Çend sala bi şunda ji bi emrê Xwadê can da. Tabî mala Ûsiv ev yek ji bîr nekir. Çend mehan piştî mirina Xalê, î malê Ûsiv biçûk, Osik, serê sibê xwe dide bendê Hemikê û li ber derîyê êxir du guleyan tê de sar dike. Hemikî tavne dimire.” Hê ku şor di devî Alke da bû, Colo î xwe tevê dike û dibêje “Erê lo, ew çî xwîn bû, ew çî xwîn bû, ji ber derîyê êxir heta erxa alî din a rêyê her der di bîn xwînê bûbû.” Di ser vê gotina Colo ra pixkinî kete civatê. Bi vê gotina Colo kenîyan Ji civatê Kelo aciz bûbû. Xe negirt û got “Colo, ma yeke te ji kêmbê. Tu ne, kekî te Hemikê nasnake. Bicehime here, mimagî berdûş. Tu van derewan çing li hev tînî?” Derewên Colo hemhema gîştik bi vî halî bûn. Xwe teve her meselê dikir. Hinek pê dikenîyan û hinekan ji xwe pê aciz dikir.

Husîn ê ku Colo pir baş nas dikir, nizanî bû ku ji Colo bawer bike yan na. Tu gotinên din ji li ser meselê nekir. Rabû ser xwe û ji Colo ra got “Birako, berî ku tarî di herdê keve, em herin mal. Na Eş ji me mereq dike. Em herin mal ji xwe ra çayekê vexin û paşê ji serê xwe daynîn û pal

bidin. Xwadeyî mezin e, emê ji te ra çareyekê bibînin.

Coloyê ku berê bîstekî girî ji çavan dihat, bi kêf bû. Herdu hevalan bere xwe dane malê. Bi rê da xwanga wî Melek hat bîra Colo, lê zû ji bîr kir. Mesela girîng, sebeba reva wî ya ji gund hate bîra wî. Miruzê xwe tirş kir, wekî ku yek wî bi xwêra bikşîne bi gavên biçuk xwe da pê Hûsîn. Bi ber xwe ket. Bi gotina Husîn “Colo” vecinîqî û hate xwe. “Colo, ê ku ez dizanim, tu yî ketim î\*. Cendirme ji ku de dizanin ku eskerîya te hatîye. Li ba dewletê li tu deran navê û qayda te tune?” Colo hema lê veğerand “Ez çî dizanim birango, na mixtêr ez têva dam. Tu jî dizanî, gund î tijî nexwaz û hesûd e” Husîn xwast tiştêkî bêje, lê dengê xwe nekir. Bikira wê çî bûbûya, Colo yeka bigirta di yeke din gîrê-bidaya. Husîn nexwast ne xwe û ne jî Colo aciz bike. Mesele çî ye, ewê derketiba meydanê.

Husîn û Colo çûne malê, Eş ê li ser sikanê bû. Eşê çay ji çêkiri bû, Rûniştin çaya xwe vexwarin, ji vir ji wê çend gotinên xwe kirin û çûn raketin.

---

\* Ketim yan jî ketûm, peyveke erebî ye ku yek ji wateyê wê “tişt yan jî kesê ku bi awayekî fermî nehatiye tomarkirî, wenda” ye.



# Şeveke koronayê

Adem Özgür

**Niha wext nivê şevê ye.**

Min bi roj li ser vîrusa koronayê (jê re dibêjin Covid-19) êpê nûçe amade kir û di derheqê vê mêratê de gelek gotar xwend.

Na, ez naxwazim ku ji we ra qala vayrosê bikim, jixwe we her roj, saet bi saet, deqqe bi deqqe mêla xwe dida televîzyonan, malperan û rojnameyan.

Me gîştikan mirina xwe di xeberan da temaşe dikir, xwend û guhdar dikir. Me, hemû dinyayê!

Wexta va nivîsa dihat nivîsandin li ser sed hezarî mirin, nêzikê du mîlyonan pêketî (vaka) hebûn. Dîsa wexta va nivîsa dihat nivîsandin, li pîr derên dinyayê derketina derve qedexe bû. Jin, zarok, kal û pîr û mêran ji tîrsa mirinê nediwêrin ku derkevin derve.

Ma derketina derve tenê ji kurdan re qedexe bû?

**Niha wext nivê şevê ye.**

Ez ê serê sibê dîsa li ser vayrosê nûçeyan binivîsim: Bi sedan mirî, bi hezaran nexweş, hêvîyên ku hatin

şikestin, girî, qirîn, şîn, ken, hêvî û şahî.

**Jiyan berdewam e.**

Şaîrekî gotibû, “Tiştên ku hatin û çûn mîna roj û şevê ne/ Carna êş, karûbar û şahî/ Carna di nav xalî û çamûrê da/ Ê li dawîyê, şeva reş di ser me da hildiveşe.”

**Niha wext nivê şevê ye.**

Ez dixwazim çîrokekê binivîsim an jî qala çîrokekê bikim.

Ji kê ra?

Ji ber tîrsa mirinê li dor me kesek nema.

Nabe ku herim zaroktîya xwe jî û êdî kesek mêla xwe nade çîrokan jî.

Walter Benjamin, nod salî ber vê va pîrs dipîrsîn: “Kê/kî îro li kesên ku qala çîrokên baş dîkin, diqelive? Gotinên pêşîyan îro alîkarîya kê dîkin? Ma kesên ku li ber mirinê ji me ra peyvên baş dibêjin?”

**Niha wext nivê şevê ye.**

Ez ê serê sibê dîsa bi dehan gotar, nûçe û nivîsan bixwînim. Di van da êşên giran hene ku mirov nikare

xwe ji wan dûr bixe: Mirina  
cîwanên kurd, zarokên ku ji  
birçîbûnê dimirin, şerên welatên  
mezin ên qirêj, jîyanên pênerên  
bi hêvî; jinên ku rastê dest avitina  
mêran dihên, jinên di kolanên şev-  
reş de dihên kuştin; keçikên ku di  
panzdehsalîya xwe da dihên zewi-  
candin...

Me şev û roj qirêj kirin: Dawîya  
şeran naye, xweza her talan dibe;  
deng kirin, gotin, nivîsandin sûc e;  
hezkirin guneh e.

**Niha wext nivê şevê ye.**

Îro du nûçe hebûn, di herdu mija-  
ran da jî dîroka kurdên bêbext xûya  
dikir: Dewleta Tirk ji dayikeke  
kurd ra hestûyê lawê wê şand, bi  
kargoyê! Rejîma hov a Îranê, sîya-  
setmederekî kurd darda kir.

Mirin, êşa dayikan, hêrs û îxanet.

Wext nivê şevê ye, lê min mêla  
xwe da ku li vî bajarê stêrk tunene.

Enqere, 11.04.2020

## Gotina mezinan: *Gotina xweş bihara dilan e* **Ziman**

**Servet Xelikanî**

Ziman

Dengê dilan

Carinan xweş carinan giran

Hin ra tîne zivistan û baran

Hin ra wek bihar tîne pêlan

Gul li ser gotinên ciwan, pîran û kalan

Jîyana gotinên dirêj e wek yên daran

Ji bîr meke gotinên mirovan

Carinan şîrîn carinan birîn

Eman eman dengê dilan

Dengê dilan

Ziman.

## -ÇEND KURTENÎVÎS-

Nuh Ateş  
nuhates48@gmail.com

### Qirana Koronayê

**V**iqasî ku di bîra min da mayîye, dema zarokti û xortanîya min, ji nexwaşîyên ku bi virûsa peyda û belav dibûn ra digotin, „derd“ yan jî „bi derd ketin“. Nimûna, „sala ku zarok bi sorika ketî“. Mezinan qala kombikom mirina zarokan yê ku zemanê berê bi dêrd ketî (nexwaşîyên zarokan) û mirî dikirin. Wî zemanî hîn derzî-derman tunebûye.

Qir, qirbûn û qiran vîketin jî dihate gotin lê ev pir caran ji bo heywanên ku bi derd û nexwaşîyên vegirtî dimerin dihate gotin. Qiran vîketo/vikeve wekî nifir jî di kurmancîya kurdên Anatolîyayê da heye.

Li dinyaye bêhesab vîrus hene. Korona vîruseke nû ye. Bi gotina hen zaneyên vê mijarê, merivekî li bazareke masîyan li bajarê Wuhan (Çîn) bi pêbûnê ew ji heywanekî nexwaş vegirtiye û ji wir da belav bûye. Niha, di demeke kurt da,

ew ê li her derê belav bûye û bûye metirsîyeke mezin. Wê duzana welatan û jiyana merivan serûbin hev kiriye. Ew ê bûye pandemîyeke mezin û kûjer. Vîrusa korona ew cins e ku bi rêya ba/hewayê jî xwe digihîne merivan. Li mal mayîn, ji hev dûr sekinin, pakijî û şuştina destan muhim e!

Ma însan bi xwe jî bi hen kar û kirinên xwe, bi şerên li hemberî hevûdu, bi zîyankarîya li klîmayê, li xwezayê û li her curê jîndaran ne heyîyeke kûjer û zîyankar e? Ew î him li serê xwe û him jî li serê dinyayê bûye bela û metirsî. Eger rojekê pêşda pêşî lê neyê girtin, guman heye e ku qirana koronayê rê li ber qirîzên aborî, şerên navxweyî û navdewletî vebike.

Bêguman ji alîye aborî da jî va pandemîya xopan zîyanekê bide kurdên ku li Anatolîya Navîn dijîn. Piranîya wan ji alîyê aborîyê da ji Awropayîyan yê ku bi eslê xwe ji wê cîûwarê ne û li welatên

Ewropayê dijîn, bigihînin. Ji wan bi hezaran havînan tetile xwe li ci-hwarên bavûkalan li Anatolîyayê derbas dikin û bi vî rêyê ji aborîya wê derê ra dibin alîkarên xurt. Lê îsal çûyîn û hatinên wan ji av-ûrûyên koronayê da pir bi zehmet be.

Çi hêyf e, bi ser tirs û cirma nexwaşîyê da cirma aborîyê!

### **Vîrusa zimankûjîyê**

#### **Nexwaşîya sedsalînî li Tirkîyê**

Li gor xebera Ewrenselê (03.02.2020) gazeteya hefteyî ya bi kurdî, Xwebûn jî li Hebixaneyê Bakirkoyê di nav weşanên qedexê da cîh digre. Revebirîyê bi bahaneya „zimanekî ku naye fehmkirin“ nehîştîye heftenameya kurdî, Xwebûn bikeve hundirê hepisxaneyê û destê muhabirê MA, Şadiye Eser.

Serokatîya Komiteya Perwerdeyê ya Hebixaneyê, derheqa sebeba nedana du hejmarên 23-29 û 30ê Kanunê û 5ê Çilêyê yên Xwebûnê bo Xanim Eser da wer gotîye: „Gazeteya Xwebûn gişt bi

kurdî ye, ji ber ku zimanê wê nehatiye fehmkirin û naveroka wê nehatiye zanîn. Eger Şadiye Eser bixwaze gazeteyên xwe bi tercumanekî sondxwarî wergerîne tirkî, hingê Komiteya Perwerdeyê mijarê careke din di ber çavên ra derbas bike.“ Halbuku karê wergerandinê di eslê xwe da wezîfeya serokatîya hepisxane ye.

Di genên dewleta Tirk da vîrusa nijadparestîyê heye, an jî bi gotîneke din vîrusa kûştin û qirkirina zimanê kurdî heye. Dewleta Tirk û piranîya hemwelatîyên wê yên tirk-nijad ev sed sal e ku bi vî nexwaşîyê ketîye û zimanê kurdî qir dike. Tiştê ecêb ew e ku Tirkîyê zimanê kurdî tune dihesibîne, di tu belgeyên resmî da navê zimanê kurdî derbas nabe, di protokolên Meclîsê da bi herfa X tê bi navkirin. Meriv dikane bibêje, dewlet zimanê kurdî wekî vîrusekê dihesibîne, vîruseke ku dewlet û welatê tirkî parçe dike.

Gotîneke mezîna wer dibêje: Xwedîyê xerawkarîyan tirkî xwe dikole.

# Lîstikên zarokatîya me

Fatos Koyuncuer-Brunner

**D**ema ku ez zarok bûm, em bes bi kevîr, tekstîk, çamûr û tenekeyên vala dilîstin. Leyîstok li cem kesî tunebûn. Jixwe bihagîran jî bûn. Em bê wan jî şên û bextiyar bûn. Niha li zarokên derdora xwe dinêrim, giştîk di nav leyîstokan de winda dibin. Odeyên wan tijî leyîstokên rengûreng û otomatîk in. Hemîyên wan xwedî telefon û kompûter in. Roj bi roj çendên nû li wan zêde dibin. Zarokên zemên loma ji malê dernekevin. Ji sibê de heta evarê bi leyîstokên xwe dilîzin yan jî li ser telefon û kompûterên bi listîkan dilîzin.

Em jî nedihatî malê. Tê bîra min dêya min li nav malan û kolanan li me digêrî. Me pîr caran jibîr dikir ku avê vexwin û nanê xwe bixwin.

Çawa ku em ji dibistanê dihatî, me berê xwe dida kolanan. Ferq nedikir ku derva sar an jî germ bû. Em diçûn jêra gund û li wir bi fitbol dilîstin. Keçîkan xwe dida alîyekî lawîk li alîyê din bûn. Li ser xwelî em pêxwas bê navber li pey topê de dimeşîyan. Pîr caran dîndeq an mîx di lingên me yên

pêxwas re diçûn. Lê me dîsa jî dev li listîkan bernadida.

Me ji dû tekstîkên biçûk bebek çêdikirin. Yek ji wan wek repî yek jî berwarî didan ser hevdu û bi bînekî ew bi hev re girê didan. Me parçeyek qumaş tijî herî dikir û wek topekê dikişand ser serî textîkekî.



Paşê jî me jê re bi penûsekî ruyek xêz dikir. Me ji qumaşên derdora malê ji bebeke re kinc didûrin.

Em di tarîyê de bi hestî dilîstin. Ji bo wê listîkê tim hestîyekî man-gan an jî pez yê mezin bi me lazîm

dibû. Me ew tim di cihekî de vedişerî. Êvaran em pê dilîstin. Her komê heft kevirên navincî li ser erdê rêz dikirin û xwe serpiştîkî didan paş kevirên koma xwe. Yekî/ê bi avêtina hestî dest pê dikir. Em giştik di tarîyê de li wî hestîyî digeriyan. Kê ew zû didît keviyek ji yê komê xwe dida koma din. Koma ku kevirên xwe yekemîn xilas dibûn, bi ser diket. Carcaran em bi seatan li wî hestîyî digeriyan.

Em pir caran bi hevalên xwe re yan jî bi met an jî bapîra xwe re bi heftok (giçuk) dilîstin. Li zivistanê me xwe li paş malê li ser berfê dişemitîn. Em şil dibûn û



dicemidîn lê em bi seatan li ser berfê dilîstin.

Bêguman bîlali leyîstoka me hêrî biqîmet bû. Tê bîra min bira yan jî apê min ew ji me re çêdikirin. Me bi wan pêşbirk li dar dixistin. Gelekî hêsan jî bû çêkirina wan. Bes çar pêc parçe textik û sê bîlya lazim dibûn. Ew bi mîxan bi hev ve danîn. Me ewqas ji wan hez dikir, ji bo ku em wan pir biajon, me ji parçeyek kulav jê re balivek çê dikir.

Gelek leyîstokên din hebûn em sibê, êvarê li derva û hindir pê dilîstin. Dema ku em bi wan nedilîstin jî dêya me yan jî bapîra me ji me re çîrok digotin. Zarokatîya me ji yan zarokên zemên pir baştir bû. Em bextiyar bûn, ti kêmasîyên me tunebûn. Li zarokên zemên dinêrim, giştik bê hez in, di nav piranîyê de wînda dibin. Dizanîm, em nikarin li bajaran wek li gundan tevbigerin lê divê em dîsa jî hewl bidin ku zarokên me derkevin derva û bigerin, divê ji xwezaya xwe hez bikin. Ger ku derfet bûn, ji wan re leyîstokên zarokatîya xwe çêbikin û wan hîn wan bikin.

# Lorînek ji bo Dersîmê

## Mehtab Îdelî

Apê Sil, xarziyê malbata me bû. Ji gundekî Kirşehirê hatibûn li gund bi cih bûbûn. Bi malbata wan re digotin Mala Ocêx. Li gor gotinên mezinan, bavê Apê Sil rojekê xewnekê dibîne. Di xewna xwe de kesek tê û bi wî re dibêje: „*Ev mala ê bibe mala ocêx û hûn ê alikariya merivên nexweş bikin.*“ Bavê Apê Sil ji xewê radibe û di odê de şimikekê dibîne. Paşê ji malbat û cîranan re behsa xewna xwe dike. Dûre malbat jî, gundî jî wan wekî mala ocêx qebûl dikin. Navê wan li gundên doralî jî belav dibe. Kesên nexweş û felcê li wan xistî dihatin mala wan, daku ma xweş (saxlem) bibin. Wan nexweş mist didan, qurbanên ku nexweşan bi xwe re anîne serjê dikirin, dûre li çûyîne jî du nanên malê ocêx û xwelîya sobê (tifikê) wekî teberik didan wan. Kesên pir nexweş jî şevêkê li mala ocêx radiketin.

Bi salan bav û birayên wî xizmeta nexweşên gundên doralîyê dikin. Apê Sil du birayên xwe cewî hebûn ku ji navê berjêr felc bûn. Li gora gotina gundîyan, ew gava diçûn çolê dikaribûn rabin ser xwe û bimeşin. Piştî mirina wan herdu birayan, gorên wan bûn ziyaretgeh û gava dibûye xidirelez, gundîyan serdana

gorên wan dikirine. Dema ew mirin şûnda, tê gotin wan destê xwe dayine Apê Sil. Apê Sil bi salan nexweşên dihatina mala wan bi şimikê mist didan û ew kes xweş dikirin.

Gava ez zarok bûm, ez ji apê Sil û ji efsûna wî ditirsiyam, dûre jî zatî dema mezin bûm bawerîya min bi tiştên weng nemabû. Ji ber wê qet rojekê nezî wî nebûm û min ew nas nekir. Pir caran min gava ew li paş xaniyê xwe rûdinişt û kilam distiran, dîdit. Dihat gotin, Apê Sil î dîsa distire. Min jî wekî yên din gohdarî dikir û diçûm. Feqet min qet nizanibû ku mesela deng û kilamên wî tişteki din bû; ne bi xwe, ne jî efsûna xwe bû. Wî leşkerîya xwe di dema qetliama Dersimê de kiribû û bûbû şahidê hemû qetliamê. Lê heta dema jiyana xwe ji dest da, ew qetliam bi şevan jê re bûbû xewnereşk, bi rojan jî şîna Dersimê. Malbata xwe digot, wî her şev xewn dîditi ji ber xwe ve deng dikir û digot: „Aha hatin, kuştin, mirin, xwîna here, laşê bi ser kevin, hemû kuştin kes nema.“ Dû re ew radibûye û digirîyaye. Dema ji wî dipirsîne, wî pir nedixwestiye behsa meselê bike.

Apê Sil digotiye: „Ez heta mirim qet ji bîr nakim. Jinên bi ducana siftê



li stû dinîştin (dest dirêj dikirin), dûre singû di zikên wan re dikirin dergûş jê derdixistin. Dergûş li alîyekî, jin li alîyekî dimirin. Kurik (zarok), mêr, keçik, jin, kî dîdîtin ew dikuştin. Hin bi singûyan, hin bi sîlehan, hin jî dişewitandin. Min tehemûl nedikir, car car bi dizî li paş dimam, direvîm kortan (newalan) digirîyam, dîsa ji tîrsa re vedigeriyam şûna xwe. Em sê çar heval bûn yê kurd, me li hev mêze dikir û em digiriyan. Pir jî nêzî hev nedibûn da ku me ferq nekin. Ew rojana ji me re bûbûn îşkence.“

Piştî xizmeta xwe ya leşkerîyê xelas dibe bi şûnda, ew dîsa vedigere gundê xwe. Heta dema jiyana xwe ji dest da, xizmeta nexweşên dihatî mala wan dikir. Têkiliyên wî yê civakî, piranî bi mêvanên wî yê ku dihatin ziyareta wî re bû, wekî din bi doralîyê xwe re pir tunebû. Li jiyane sîva hatibû (xeyîdî). Ne dikete nav civata mêran, ne jî diçû malên cîranan. Pir caran bi tenê li ber mala xwe rûdinişt, car car jî bi tenê diçû çolê digeriya. Li çolê bi navê „Kaniya Apê Sil“ kaniyek jî çêkiribû. Apê Sil li gundekî Anatoliya Navîn heftê salan bi şev û rojan şîna Dersimê kiribû. Heftê salan ne xwe efû kiribû, ne jî yê din. Ji Dersimê heştê km dûr û ji wan bêxeber. Kî dizane belkî jî kurdîtiya xwe cara siftê li wir nas kiribû. Li welatê xwe yê jê bêxeber, di

nav xwîn û mirîyên xwişk û birayên xwe de. Bêçaretî, bi êş û bi hawaran...

Mixabin, ez mabûm derengê. Dîsa jî bi dû çîroka wî ketim. Her kesî digot, „Em pir tişt nizanin, Apê Sil nedixwest pir behsê bike. Kilamên xwe jî zatî xwe bi xwe digotin û digiriya, kesî fehm nedikir ku çî dibêje.“

Ez rojekê çûm ser gora wî, min xwest çîroka wî ji wî bibihîzim. Ne rabû, ne jî serê xwe rakir. Ji dûr ve dengê wî kete guhê min, digot: „Min ew kul û êşên xwe bi xwe re kirin bin axa surgunîyê, wekî hemû kul û êşên kurdan. Bihêlin ma ew di bin erdê de bimen û careke din dernekevin. Mirî li ser mirîyan, gor li ser goran, bi hezaran kesên bêguneh. Li Agirî, li Gelîyê Zîlan, li Dersimê, li Helebçê, li Şengal û Rojava û kî dizane hîn çiqesên din...“ Dûre ji got „Bêjin ma kurd bi yek bin û xwedî li dîrok, çand û zimanê xwe derkevin. Ew zimanê ku di mejîyê me de bi zora dijmin hatiye zîndankirin. Da ku ew azad bibe, bi zimanê xwe deng bike, binivîse û bifiki-re!“

Ew roj îroj Apê Sil bû hevalê min. Ez êdî ne ji wî ditirsyam, ne jî ji efsûna wî!



## Xewnên gerok...!

ne lal im,  
ne bêçar.  
janên bi qeydan,  
dilên kilîtikirî.  
xelatên berê rojê,  
li tîrêjan, sûwar im...  
    ewrên stewr,  
    min dotin.  
    li dîroka bêpar,  
    li min, xwîn kirin bar...  
ferman e, li dar,  
ji bayê gilokan,  
agir min hêra,  
zinar li pişta ar...  
    pencê teyrê baz in,  
    sêdara min e,  
    tîr e mêjangên te,  
    li konên sirgunîyan...  
di çavên,  
singu lûleyan de,  
dinivîsînin,  
qewlên min û te,  
koçberîya kenên te,  
    verger;  
    ji ava heft bahran,  
    baranên salvegeran,  
    berê...  
duanzdeh deşt û berîyan,  
ferhenga rizgarîya te ye,  
li ber destan...  
nalîn ji brûskan,

kurm-e şîrî, ya bextfiroşan,  
pale û eşêfvan,  
kef û kêfa textê- teresan,  
kirasên kurtêl û parîyan,  
hewandin parsa derîyan....  
    zexelî ne,  
    ji xwe direvin,  
    hefsar di dest de,  
    revok...  
mexelî ne,  
dest-kujerên xwe ,  
qaqlîbaz in, dixwînin...  
xewnên gerok...  
    min divê;  
    çirûskeke,  
    ji stêrkên,  
    berbangan....  
lê lê ,lê lê....  
lo lo, lo lo...  
    bilind tevbigere,  
    ger te navê xwe ,  
    hiland û lîland...  
    sond û ahd e, li min;  
    minneta mirinê,  
    li derê han....  
ser se an,  
ser çavan...  
bi xêr bê ....  
KURDISTAN...

**Xalit Temlî**

# Çend mînak ji gotinên pêşîyan yên kurdan bi naveroka felsefî û zanistî

S. Erdem

## 1. Heta min xwe nas kir, min emrê xwe xilas kir<sup>1</sup>

Wateya vê gotina pêşîyê, mîna hemû gotinên pêşîyan, pir pêşketî ye. Lê di vê gotinê de tiştek heye ku bala meriv dikşîne, ew jî wek hevîya felsefeya vê gotina pêşîyê û gotina William Shakespeare (Şekspîr) weha ye: “Qonaxa herî bilind ku mirov dikare bigihîje xwedibûna bîra hest û ramanên xwe û xwe naskirina xwe ye.”<sup>2</sup> Her weha Yûnus Emre jî gotîye:

*“İlim ilim zanîye*

*İlim bi xwe zanî ne*

*Eger mirov xwe nizanibe*

*Ya ew çiqes xwendin e!”<sup>3</sup>*

Xwezanîna xwenaskirinê hem karekî pir zor e, hem jî marîfeteke pir mezin e ku mirov xwe nas bike, yê kesên din li dorhêlên xwe jî baş fêm bike. Çimkî rêya fêmkirina

mirovên din, di xwenaskirinê re derbas dibe. Meriv heta yên din, wek civat, kultur, hemû bûyer, kirûyên rûyê erdê û dorhêlên xwe û kaînatê nas neke û fehm û feraset neke, ne mimkûn e ku xwe jî nas bike.

Girîngîya xwenaskirinê, ji efsaneyan ra jî bûye mijar û qala wê tê kirin. Wek mînak Efsaneya Teyrê Sîmir: Li gor efsaneyê Sîmir, teyrek efsanewî ye û li paş Çiyaye Qaf dijî. Siltana çûçika ye. Di histûyê wê yê dirêj de helqeka spî heye, pirtikên wê mîna zefrên in, deng-xweşik û çûçikeke mîna însanan gir e. Rojekê çûçik, ji bo siltanê xwe bibînin kom dibin. Bi hêvîya siltanê xwe bibînin ber bi Çiyayê Qafê ve bi rê dikevin. Lê belê rê pir direj e û rêwîti jî zefh zor e. Çûçik berê di “Behra Evînê” re derbas dibin. Paşê di “Gelîyê Veqetandinê” de difirin. Ji “Deşta Çavçilûsî”

1 <https://www.facebook.com/Dilkul.Ciziri/posts/468501579886529>/tarîxa gehîştine: 21/01/2020

2 <https://www.cafrande.org/insanin-erisebilecegi-en-yukse-asama-kendini-tanimasidir-shakespeare-goethe/>, tarîxa gehîştine: 20.01.2020

3 <https://www.antoloji.com/ilim-ilim-bilmektir-yunus-emre-bir-siir-bir-yorum-siiri/>, tarîxa gehîştine: 29.01.2020

derbas dibin û sapeyê “Gola Çavnebarîyê” dibin. Ji çûçikan hen (hinek) didin nav Behra Evînê, hen jî di Gelîyê Veqetandinê de ji kerî vediqetin. Hen hêrs dibin û gêrî Deşta Çavçilûsiyê dibin, hen jî çavnebarîyê dikin û didin nav Gola Çavnebarîyê.

Dema rêwîti diqede, tenê sih çûçik digehîjin Çiyayê Qaf û çûçik, siltanê xwe Teyrê Sîmir li wirê nabînin. Di paşîyê de peyv, ew sir e çareser dikin. Di Farisî de (di kurdî de jî) maneyê “sî” yê, sih e (30) û maneyê “mûrg” ê jî çûçik e. Yanê “sih çûçik”...

Di paşîyê de ew sih çûçikên gehîştine Çiyayê Qaf fêrî dikin ku siltana ku lê digerin, bi xwe ne û rêwîtiya rast jî, rêwîtiya ber bi cihana hundirê xwe ye.<sup>4</sup>

Ê meriv herî dawîye de çûyî ferqê, heqîqeta xwe ye ku ew jî bi rêwîtiya ber bi cihana hundirê xwe û xwenaskirinê dibe.

Li ser girîngîya xwenaskirinê pir tişt hatine gotin. Lê kurda ew qas tişt û mane di gotinêka pêşîya da bihartine û bi kut û derûn gotine: “Heta min xwe nas kir, min emrê xwe xilas kir.

## 2. Çiyayên bilind in bê av nabin, gelîyên kûr bê nav nabin

Her gotineke pêşîyan xezîneyek e û tê de bêhejmar ceribok, zanistî, wate û felsefe hene. Wek mînak: “Çiyayên bilind in bê av nabin, gelîyên kûr in bê nav nabin.” Ew Gotina pêşîyan li gundê me (Gundê Hesina, Şereflîqoçîsar, Enqere) tê bikaranîn. Di zik vê gotinê de zanîn û ceribandina li ser erdnigarîya beşerî û fîzîkî heye. Di zanistîya erdnigarîya fîzîkî de (zanistîya klîmatolojî) zanîna weha heye: “Çiya, ambaren avê ne.” Ji bo ku deverên bi çiya bilind in, li wan deveran şilî (berf û baran û hwd.) pir dibare. Ew şilîya dihele dibe av û teva kanîyên ser erdê û binerdê dibe û kanîyên avê pê dewlemend dibin. Di vê gotinê de zanîn dikeve zik erdnigarîya beşerî (erdnigarîya cihgirtine) jî weha ye: Li hin deveran mirovan, di binîyên gelîyan da cih girtine û li wan deveran jîyana xwe berdewam kirine. Bi vî awayî ew deverana bûne gund, zozan, bajarok û hwd. her yek jê bi navekê bûye.

Di vê gotina pêşîyan de yêk bala meriv dikşîne ew e: “Di dîroka mirovatîyê de bandora ceribandîna cihekî girîng digire û car caran jî

4 <https://indigodergisi.com/2014/04/efsanevi-kus-simurg/> tarîxa gehîştine: 09.02.2020

bandûra zanistê derbas dibe û bi hezar salan berdewam dike û tê. Ew bandûra ceribandî, di çanda civakan de wek gotinên pêşîyan, biwêj û hwd. tê bikaranîn û eşkere dibe.”

### 3. Qelew qet dihêlin, ma pirç bi fiqaran de were.

Ew gotina pêşîyan jî li gundê me tê bikaranîn û pêwendîya wê gotinê, bi felsefe û zanistîya aborî heye. Di felsefe û zanistîya aborî de ramana sermîyandarî heye û filozofên mîna Adam Smîth, Karl Marx, Max Weber, Davîd Harvey û hwd. li ser konsept û fonksîyona vê ramanê gelek xebatên zanistî afirandine. Li gor

wan, di civakên kapîtalîst de bi sermayeyê re têkildar awayê hilberînê pêkhatin dibe. Ango xwedanên sermayeyê, dixwazin ku sermayeyên xwe hîn zêde bikin û ji bo wê jî him keda karkeran kedxwar dîkin him jî feqîran berve berxwarine dîkin ku ma hilberîya wan berdewam be û sermayeyên wan hertim zêde be. Bêguman bav û kalên me yên pêşî, haja xwe ji Smîth, Marx, Weber, Harvey û ramanen wan tunebûn. Lê wan jî li gor ceribandin e çaxa xwe çavnêrî kirine û gotine: “Qelew qet dihêlin ma pirç bi fûqaran de were.”



## AGAHDARÎYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatolîya Navîn wêneyekî kevn di Bîrnebûnê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatolîya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatolîyê didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmancîyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopîyekê bi rê bikin. Bi vî yekê em ê bi dewlemedîya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr bînin.

*Redaksiyon*

# Quling

Qulingê bask şikestî  
Birîndar  
Li pala çiyakî  
Kûr kûr dinalî  
Bêhal û westî  
Qulingo  
Koçero  
Wek min bê welat û bê waro

Bêje qulingo beje  
Bi qurşîna kijan malşewitî  
Tu ji refa xwe veqetî  
Koçerê kîjan warî  
Ma hêlîna te jî xirab kirin  
Hene  
Xwîşk û dayîka te jî  
Mîna keç û bûkên min  
Mîna dayîkên Şengalî birin  
Bajar bi bajar firotin  
Gund bi gund bazar kirin

Nenale qulingo nenale  
Yezdanê dilo van  
Rojekê li me jî were xêrê  
Pêşeroj bihar e  
Bihara were  
Barana bibare  
Emê carek din şîn bikin  
Wan çiya û waran  
Azad û bi rûmet  
Veşerin  
Warê dê û bavan.

**Mem Xelîkan**



Photo: Mûlla Evîndar

Evdal ji nîvro şunde her roj, ji xwe re derdiket, bi rê diçû, li perê zozanê, li nav giyayên rengîn, li sîya darê destê xwe dikir bin guhê xwe û dest bi klaman dikir, bi çavên girtî, bênavber, wî tim distirî. Dînalî, dikalî, ji xwe derbas dibû. Dengê wî li esman belav dibû û bi ser zozanê de dihat. Dema ku wî çavên xwe vedikir tim didît ku derdora wî tiji însan bûye û wî guhdarî dikine. Her roj weha bû.

Navê wî, dengê wî, awazên wî li gund û zozanên derdorê jî îdî dihat zanîn. Ji wan deran jî dihatin li Evdal guhdarî dikirin.

Rojekî axayê gundekî ji dûr jî hat Evdal guhdarî kir, bi Evdal re go “were li koşka min bime, ji min re, ji mîvanên min re klaman bistirê, ez ê biqasî tu dixwazî pere,

zêr bidim te”. Evdal ewqas klam digotin lê wî cara pê pere qezenc nekiribû, ew teklîf bi wî balkêş hat, qebûl kir û dora din a rojê çû koşka axa.

Koşka axa mîna her şevê ji mîvanên wî tiji ye, ew ji xwe re sohbet dikine. Evdal li dawîyê rûniştiye. Ji vir, ji wir de gotin :

“De bêje ka tu ji me re çi klamê bêjî?”

“De bêje ka dengê te çawa ye?”,

“Tu dengbêj î?”.

Evdal li zozana xwe, li bin dara xwe bi dilê xwe ji xwe re klam digotin, paşê wî didît ku derdora wî tiji guhdar bûye, lê niha? Niha li derdora wî rûniştine, sohbet û kêf dikine, dixwine, vedixwine û klaman dixwazine. Bi vî awayî klamgotin bi Evdal xweş nehat.



Dîsa deng hatin, dîsa yekî go:  
“De bêjê lo, tu dengbêj î?”  
Evdal dest pê kir, go:

Ez dengbêj im  
Ez ne sergêj im

Lê min rêya xwe şaş kir  
Tiştêk ne baş kir

Ji şûna xwe livîm  
Hatim li we qelivîm

Klam ji dil de tên gotin  
Bi zêr û zîv nayên gotin

Dengê wî, di koşkê hilnehat, li  
şeva tarî li nav stêrkan belav dibû.

Wî çend klamên din jî gotin û  
şev bi dawî bû. Wî bi axa re go “bi  
pere, bi zêr û zîv klamgotin ne karê  
min e, li min biborîne, ez ê sibe ve-  
gerim zozana xwe”. Serê sibê zû ew  
vedigere mala xwe.

Mîna her rojekê Evdal dîsa li  
bin dara xwe ye. Deng û awaza Ev-  
dal dîsa bi ser zozanê de hat. Kesên

li zozanê zû deng bihîstin, gotin :  
“Rabin, rabin Evdal hatiye!”.

Derdora wî dîsa tiji bû, Evdal  
distirî,

gerek nema jê bipirsin ku çima  
ew hatiye, wî di klama xwe de ber-  
siv dida:

Li hêla avê dar e  
Li sîya darê Evdal e  
Li ser avê yar e  
Li dilê Evdal bihar e

Demsal bihar e  
Evdal li sîya çinar e  
Berxa belek dikale  
Evdal wek bilûrê dinale

Hevalno ez dilgiran im  
Ji dil de bargiran im  
Awaza li zozan im  
Nalîna li şevan im

Dilê Evdal kanî ye  
Şev û roj diherike  
Dilên ziwa av dike  
Dilên ziwa şa dike

Dokument!

## Dîroka kurdan a sedsalan li wîlayeta Helebê

Di împaratorîya Osmanî de kurdên wîlayeta Helebê di rapora konsulê Rûsya de.

Dokument, raporeke konsulê (Helebê) Viladîmîr Viladîmîrovîç Fon Sîmerman e ku di 29ê hezîrana 1913an de ji departementa MÎD (wezareta karê derve) re şandiye. Viladîmîr Viladîmîrovîç Fon Sîmerman (1855-?) di sala 1875-1879 Univeraîta Sankt Petersbûrgê beşê zimanê Rojhilat xwendîye. Bi zimanê turkî baş zanî bû. Heta sala 1898an li Samsûnê (Turki) cîgirê Konsul bûye, ji adara 1898 heta 1908an Konsulê Cidê (Suûdîya Erebi) bûye. Ji 1909 de bûye Konsulê Helebê.

### Werger ji Rûsî: Dr. Ekrem Önen

(L.95) M.Î.D (Wezareta karê derve. E.Ö). Konsulosxana împaratorî Rûsya li Helebê 29 hezîranê 1913. No 92.

Ji bo departemena yekê a Wezareta karê derve (Meqbûza wergirtinê: 1D. 6 tebaxê 1913. No 1805)

Ez bi rûmet dixwazim departemena yekê agahdar bikim, ku di 30yê nîsanê de ji bo No 48 ev tiştên li jêr in ji bo balyozê împaratorîya Rûsya li Konstantînopolê ragihand: Ji bo pêkanîna fermana serokatî (Excellencies) ya we a ku ji 17 qanûna pêşin ya îsal a No 316, ji bo min şeref e bi rêzdarî agahdarîyên li jêr di derbarê nufûsa kurdan di nava sînore wîlayeta Helebê (her weha sancaka Urfayê ku di van demên nêzîk de wek idarak bi serê xwe

hatiye qebûl kirin), hejmara wan, karê dikin, zimanê pê dipeyîvin uhw. ku min karîbû berhev bikira pêşkêşî we bikim.

Derengketina van agahdarîya heta nuha sebeb ew e ku bi tevayî li Turkî bî destxistina hinek agahdarîyên weha cidî ku layikî (L95ob) mirov pê bawer be, gelek zehmet e.

Bawerîya bî agahîyên vî rengî, agahîyên ku tên xwestin, belkî mîrov bikaribe jî wîlayeta bi dest bixe, agahîyên resmî tevî hemû tiştan jî tiştên mirov dixwaze ne jî sedî sed rast be jî, pir nadir mirov dikare bi dest bixe.

Li vir dimîne çûna şexsî nav herêmên cuda, ew jî gelek wext digre her weha ev jî pir nadir e ji

bo konsulekî, bi teybet dema zex-tek (kontrolek) mezin li ser neçûna wî ya kar heye, her weha di pirsê berhevkirina agahîya di derbarê kurdan de. Agahîyên weha jî navenda îdarî a wîlayeta bi tevayî nayê bi dest xistin

Li vir bal nekişandine ser agahîyan, belavbûna (nufûs) li nehîyê cuda de.

Almanak (salname) a wîlayeta Helebê (min ji bo muqayesa bi xebat û agahîyên me di derbarê wîlayeta Helebê bi dest xistine û a salnama 1324 hîcrî) bi kar anîye. Salname hevagahîyên tevayî dide, li vir agahîyên derbarê milletan de nade, bes derbarê olî (dînî) de dide. Her weha ji aliyê lîteratûra zanistî çî ji rojhilat çî ji rojava ne dewlemend e, hewqasî (L.96) jî alî min de tê zanîn.

Em werîn ser arşîva ÎMP a konslosxaneyê, karmendên berya min karkirine kêmbaldarî danîne ser vê pirsê (Kurda. E.Ö), tenê yek tişt di derbarê kurdan de di raporên xwe de diyar kirine ew jî, hew behsa çawa kurd li talana dixin, dikin. Agahdarîyê dînî pir kêmbaldarî, bes tiştên jî bo pê rapora xwe kamil bikin, nivîsandine. Di arşîva konslosxanê de min ev raporên bi

vê naverokê ku ji bo ÎMP balyozxanê dîtîn:

- Ji 25 tebaxê 1888, No 90
  - Ji 10 Îlonê û 8 çile heman salê No 103, 112
  - Ji 25 hezîranê, 3 temûzê, 20 tebaxê û 8 çile sala 1899, No 62, 71, 81 û 94
  - Ji 8 û 16 gulanê, 3 temûzê, 3 tebaxê, 20 çile û 13 qasimê sala 1901, No 43, 46, 64, 76, 91 û 105.
  - -Ji 22 ocakê û 1 çile sala 1902, No 8 û 105, û 4 sibatê sala 1908, No 14.
- Min ev raporana di derbarê

Îbrahîm Paşa de rêkirine: Ji 24 Hezîranê, 17 Temûzê û 25 Îlonê sala 1908 No 115, 127 û 160.

Di nava hemû karên li vir hatine kirin, teqrîben pirsê kurdan bala kesî ne kişandîye, ku min bi kêmayî di derbarê hinek tiştan de agahdar bike, ku mirov di derbarê vê pirsê de pê bawer be. Ji ber wê ji bo min gelek zehmet bû di derbarê vê pirsê de. (L. 96 ob)

Ji bo bi destxistina agahîyan pêwîst in, heger navê yek ji xelkê herêmê Şêx Kamîlê Gûzzî (dikare Hûzzî be jî, ji ber di Rûsî de car caran dema nav tîrêgerandin herfa H û G jî tê bi karanîn, wek mînak Hesret dibe Gasret. E.Ö) nedabana min wê zehmet ba. Ew kes li tevaya wîlayeta He-

lebê geryaye û agahdarîyen cuda berhev kirîye û bi îzah nivîsîye. Pir heyf, hîn nehatiye çapkirin. Min serî li wî da û bi alîkarîya wî ya ji dil, bi hev re min ji xebata wî ev tablîtsa ku nufûsa kurdan a wîlayeta Helebê, herêmên ku kurd daîmî rudinin û ne daîmî (koçer E.Ö) çêkir û bi rumetek mezin pêşkêşî we Excellncies dikim. Ev agahdarî min bi şert û soz daye Şêx Kamill Gûzzî ku heta ew xebata xwe çap neke ev agahî bi tu awayî ew ê neyê çapkirin û neyê belav kirin. Bi vêya re dixwazim ragihînim ku rastîya van agahîyan dikare ji 100 % li hev neyê. Wek hûn dibînin min di tablîtsa de hinek navên gunda (bi qelemê ji gotinê nivîsîye) û min muqayesa wan bi almanaka turkan re kirîye ku bêtirê caran ne li hev e, cihê bi almanaka turkan re li hev e min di tablîtsê de diyar kirîye. Ji xwe dema karekî bi serê xwe mirov bike û bê ku jêderê hebe wê muqayesa wê bi salnama turkî re bibe. Lê em dikarin bêjin heta nuha yekemîn xebat û ji jêderên din ên serbixwe (L97) dî vê pirsê de hatine bidestxistin. Hinek jêderên ku min ji bo temamîya kar di hinek ji wan 16 raporên ku min şandine bi kar anîye, ji van xebatên jêrîn ku

di pirtûkxana min a şexsî de heye:

- Gartsonî Гарцони (Grammatica et Vocabularie
- (Rastî правильно: e vocabulario. Г. К.) della lingua Kurda
- composti dal P. Maurizio Garzoni, Roma 1787)
- Gramatîka zimanê Kurdî adverbsa Suleymanîyê
- грамматика Сулейманийского наречия курдского языка
- Хадзко (Chadzko. Etudes philologiques de la langue Kurde
- dialecte de Souleïmanié. Journal Asiatique –
- extrait No. 4, 1857)17
- - Ferhenga Kurdî Fransî a konsulê me yê berê yê Erzrûmê Jaba
- a ku Yustî yê Fransî weşandiye.
- курдско-французский словарь бывшего консула нашего в
- Эрзеруме Жабы,
- опубликованный
- французом Юсти (Dictionnaire Kurde-Français par Mr. Auguste Jaba, publié par ordre de l'Académie Impériale de Sciences par Mr. Ferdinand Justi, St. Pétersbourg, 1879 [463 p.])
- Her weha çîrokên Kurdî yên wî и курдские рассказы его же
- Recueil de notices et de récits

Kourdes par Mr.Alexandre (?)  
Jaba, (Л. 9706.) St. Pétersbourg,  
1879).

Ez bêm ser agahîyên ku ev rapor  
ji wan hatiye amadekirin bi rûmet  
pêşkêşî we Excellncies bikim. Li  
gor Gartsonî di pirtûka xwe de  
ya li jor tê behs kirin bavê wî 18  
salan li Mezopotamyayê jîyaye û  
dinivîse ku di qirnê 18an de gelek  
mîrîtîyên kurdan hebûn û Kurdis-  
tan tereîorîyûmek gelek fireh bû, bi  
dirêjayî rêya (meşa) 25 rojan û bi  
frehî rêya(meşa) 10 rojan bû.

Li gor gotinên wî 5 mîrektîyên  
kurdan ên naskiri hebûn bi tey-  
bet mîrê Bitlîsê, Çolemêrgê,  
Cizîrê-herweha jê re tê gotin  
mîrê Botan, mîrê Amedîyê, mîrê  
Qereçolan an bi awayê transkrîp-  
tse; Qara-Çûvar-lan, bi kurdî tê  
meena çar kelayên reş.

Bi ihtimaleke xurt mîrektî û  
xanedanê din jî hebûne ku bavê  
Gartsonî behs nekirîye. Ji Helebê  
- qozîya rojavayê ku kurd lê bicî  
ne bi dirêjaya rêya 25 rojan li alîyê  
din di sedsala dawî de xanedanîya  
Alamperts (L98) bi navendîya  
bajarê sereke Beyazîd hebûye, a  
Gartsonî behs nake, serwerîya wê  
ji alîyê turkan de ji ortê hate ra-  
kirin. Piştî çarîka duda ya qirnê

XIX bi ketina Beyalûl Paşa mirek-  
tîyên kurda ku bavê Gartsonî behs  
dike ev mîrektî ne. Wek mînak  
kurdê Qere-Çûvar-lan ku bi kurdî  
dipeyivîn ji xwe re gotin; soran,  
yên bi turkî dipeyivîn; Baban.  
Kurdê Amedîyê; bahdînan, kurdê  
Colemêrgê; şambo, kurdê Cezîrê;  
Bota a Kurdê Bitlîsê; bîtlîsi. Li gor  
şahadetîya bavê Gartsonî hinek ji  
van mîran koka xwe digîhandin xe-  
lîfê Bexdayê wek mîrê Amedîyê û  
Mîrê Çolemêrgê.

Hemû ev navana di xerîteyên  
serdema me de hene.

Li gor xerîta li divara a Kiperta,  
Hekarî hinekî li başûrê Koçones a  
li cem dêra Mar Şemûn dikeve.  
Amedîye li bakurê Musilê hinekî  
li rojhilat 41 derecê dirêja ye bi 37  
derecê firehî li bakur dikeve. Hinekî  
li başûr bi herfên (L. 98 ob) mezin  
nivîsandine, Bahdînan. Amedîyê  
bajarê Selhadînê Meşhûre (Seha-  
dînê Eyûbî) torinê mîrê Amedîyê  
Îmadedînê Zengî ye. Kurdê Qere  
Çûvar Lanê, Kurdê Suleymanîyê,  
serdema me de ku di nava wîlayeta  
Bexdayê de ye. Navên din bi Cizîr  
û Bitlîse tên naskirin ne hewceyî  
îzahê ye. Bi ihtimalek xurt ev agahî  
ne hemû kurdên serdema me zanin.  
Ji ber nuha di nav xwe de wek eşîr

û malbatên biçûk ji hev belav bûne û gelek caran nizanin ji kijan kokê tên. Hemû kurdên wîlayeta Helebê ji kurdên Mezopotamyayê ne û wek yên paşê bi heman diyalekta asasî dipeyivin. Tevî her tiştî ji hev fam dikin dervî hinekê ji eşîra Berazya ku bi cîh nebûne.

Teqrîben hemû eşîrên hatine dora Helebê tev bi cîh bûne. Gelek eşîr li cihê bi cih bûne navên xwe li gelek nehîyan kirine. Di tablitsa ku min pêşniyar kirîye paragrafa notê de, min hejmara gundan, malan, nufûsa wan, jin û mêr li her nahîyekê, her weha karên dikin û bawerya olî û hwd (L 99). Gundê kurdan ên li wîlayeta Helebê 1046 gund in, nufûsa wan dike dor 123.959 bi jin û mêran. Heger em vê reqemê li ser asasê ku salnama turka ku nufûsa wîlayeta Helebê dane rêdan ku 903.269 bi jin û mêran, wê demê nufûsa kurdan 13,5%. Û li ser vî asasî di salnamê de nufûsa misilmanan 759.040 bi jin û mêran, wê demê di nava mihemedîyan de nufûsa kurdan dike 16.05% ji nufûsa tevaya wîlayetê. Lê di rastîyê de ev reqem gelek di binya rastîyê de ye, ji ber ne mumkun e mirov bikaribe hinekî weke kurdan ku herdem di tevgerêde ne

û heta yên bicîh bijmêre. Wek Şêx Kamil dide rêdan, dibêje ev reqem ji 50% di binya rastîyê de ye û lazim e heta nêvî zêde bibe.

Di 17 qanûna îsal de bi No 361, ji alîyê balyozxana împaratorîyê jêderê ji pirtûka Lerx a bi navê *“lêkolîn li ser kurdên Îranê”* hatibû şandin. Ez bi rûmet dixwazim pêşkêşî we Excellncies bikim, a li ser (L 99 ob).

Ew eşîrê ku tê de hatine navkirin ji alîyê min de lêkolîn li ser hatin kirin. Her weha lêkolîn li ser eşîrên ku di jêderê de nehatine navkirin ku dikevin sînorê wîlayete Helebê jî hatin kirin. Kurdên Serkanlî, Selîfanli û Oxianli li vir nînin. Ewana lazim e bikevin ser wîlayeta Diyarbekirê ya ku Mêrdîn pêve girêdayî ye. Eşîra Şeyxanlî, li gor agahdarîyê li vir gihane min, ew perçak ji eşîra Baraza ne. Hinek ji wan bi kurdên din re li sancaka Urfayê ne, hinek ji wan li nehîya Şeyler qeza Kilîse ya ku sancaka Helebê ye dijîn. Eşîra Torin (ku Torin bi kurdî ji serokê eşîrê re tê gotin an yê îdare dike) û Mûrsî li vir tunene.

Eşîra Barazî li vir dabeşî 8 kola dibin: şedadî, zervanlî, ketkiyalî, danayî, alayedinli, bîdjanli, şeyxali û xaltanlî. Ew bêhtir li qeza Surûcê

ya sancaka Ûrfayê dirûnin her weha li nehîyê qeza Surûcê Evi Axaç, Tekyûlû, Kaba Haydar, her weha li nehîya Şêxler a qeza Kilîsê a sancaka Helebê rûdinin. Bê nehîya dawî ew li 376 gunda belav bûne û nufûsa wan dor 27.674 bi jin û mêran ve, heger em nehîya Şêxler jî bidin ser, wê bibe 426 gund û nufûsa wan dighê 31.502 bi jin û mêran ve. Kurdên ku li qeza Surûcê dijîn di nava Alayê Hemîdîyê de bûn û li talanê xelkê dixistin evêya ji gazîne konslosa ve dîhate dîyar kirin. Hinek ji nişteciyên Barazîya di nava eşîra Bazîkya li nehîya Reşî ya qeza Rûmkale ku bi sancaka Ûrfayê ve girêdayî ye dijîyan. Eşîra Şekakîya heye her çiqas wek ku li gor Lerx û Jaba (Recueil de notices et de recits Kourdes) wek kurd hatine diyarkirin jî (diyar e ne rast e ji ber mirovê vê eşîrê dervî turkî bi kurdî jî dipeyivin) Li gor gotinên Şêx Kamil turkmen in ne kurd in. Hinek ji vê eşîrê ku di nava wîlayeta Helebê de dijîn, li gor salnamê her weha li nehîya bi navê eşîrê (şekak nahîyesî) a qeza Kilîsê ku bi sancaka Helebê ve girêdayî ye dijîn, ku ji 34 gundan pêk tê.

Eşîra hesenanlî, çemkiyanlî, bameriyanlî, kûmenekêş û cemaledînî

lî gor xerîtê li bakurê Heranê dijîn, dikeve başûrê Ûrfayê. Dervî wan 5 eşîrên li jor min behs kir, di listê de 2 eşîrê din ku li başûrê Ûrfayê eşîra şexanlî û torûn. Li ser eşîra şeyxanlî li jor min behs kiribû, eşîrê din me nikarîbû bidîta. Ji xwe mirov nakare fam bike çawa ewqas eşîr di navçek weha biçûk de bi cîh bûne. Heger mirov bihesibîne ji merkeza Haranê Akçakalê heta Ûrfayê ne zêdeyî 12 seeta rê ye (meş) li gor wîlayeta Helebê her weha bi şahdetîya Şêx Kamil Heran ji 3 nehîya pêk tê. Heran bi xwe 200 gund in, Karamûk 40 gund in û turkmen- Celadî 8 gund in, li vir bêhtir ereb in. Lê her weha hinek ji xelkê mintîqê bi kurdî jî dipeyivin. Mirovê ji eşîra Kilicli li gor salnamê bi eşîra Atmalî û Sînîmînî re bi hev re dijîn li nehîya bi navê qeza Pazarçik a sancaka Maraşê.

Di tablîtsê û salnamê de ev herdu nahîye bi navên cuda hatine nivîsandin. Di tablîtsê de ya pêşin bi navê Agercalar otût-axa Atmalî, a duda Beyçe Asmanlî, di salnamê de ya pêşin bi navê Bor axa-atmalos a duda bi navê eşîra Sînîmînî ye. Kurdê ji eşîra Atmalî her weha li nehîya Çoradçiklî a heman qezayê jî dijîn, her weha eşîra Sînîmanlî li



nehîya Etraf Bazarcik û Giensûn heman qezaya sancaka Maraşê ye. (Sînîmanlî 45 gund in nufûsa wan 9 244 jin û mêr in, Attalî 29 gund in û nufûsa wan 5 884 jin û mêr) Eşîra Barak ne kurd in turkmen in, dervî turki bi kurdî jî dipeyîvin (L.101). Dervî wan li vir şikakî hene her weha eşîra Kara Husyînî ew ê ku turkmen in bi kurdî dipeyîvin, eşîra Barak û Kara Huseyînî lî Cebeleş Şêx dijîn. Eşîra Kara Bazilkî ku dabeşî du eşîra bûne Suleymanlî û Tûsyanlî li nehîya Bazikî an Bezikî û nehîya Reşî a li qeza Rûm Kale a sancaka Êrfayê ye. Tevaya wan 91 gund in û nufûsa wan dor 12 082 bi jin û mêran ve, di vê nufûsê de hinek barazî jî hene. Eşîra Kizik bi Bazikîya re li nahîya Kizik û Xezek a qeza Intabê dijîn. Heger tu herdu nehîya bihesibîne 43 gund in û nufûsa wan dor 8 245 bi jin û mêran ve. Eşîra Mûsa deklî li nehîya bi heman navî a qeza Kilîsê dijîn 67 gundê wan hene û nufûsa wan 5 571, bi jin û mêran ve. Eşîra Okca Îzînlî ku navê rast (Okca Izzedînî) û berek wan Pencane li nehîya pêşin Akca Izeddîn a qeza Kilîsê û ya duda li Nehîya navendî a heman qezayê rûdinin. Tevaya wan bi Pencanê re 40 gund

û nufûsa wan 6371 kes in, bi jin û mêran ve. Eşîra Cûm bi heman navî nehîyê a qeza Kilîsê dijîn.

Eşîra Kurd Çûm mehemedî ne li gor tiştê li vir diyar e di nav wan de yêzîdî nînin. Temama wan 50 gund in (L 101 ob) û nufûsa wan 3918 kes bi jin û mêran ve. Eşîra Birizlî li vir tune ye. Latikîyê ne girêdayî wîlayeta Helebê ye. Li bajarê Cebel el Ekrad rastî kurd dijîn. Li Helebê mihelên kurdan nînin, bes di nava mihela xiristiyana û mihemedîyan de malên wan hene. Ji nişteciyên eslî bes malek kurd bi navê Mama heye, ew jî karê faîzê dîkin. Eşîra ûracik û sînamerlî tevî hev in û li sancaka Maraşê li nehîyên Nadîrlî, Hartaleb, Camûstil, Yenîce Kale û Şeker dijîn. Herdu qezayê Maraşê li nehîya Koç abadê- qeza Elbîstan, nehîya navendî a qeza Zeytûn û li nehîya Mercemankêza Rûm Kale. Nufûsa herdu eşîra (bi kurdên nehîya Koç abad) 144 gund in nufûsa wan 22 414 bi jin û mêran ve. Dervî eşîrê ku di lîstê de hebûn, van eşîrên kurdan jî li vir hene. (L 102) eşîra şîravî li qeza Cebel Samana sancaka Helebê. Ew bi xwe êzîdî ne, ne pir in 8 gundê wan, nufûsa wan 315 kes in bi jin û mêran ve. Li nehîya Îlbeklî a qeza

Babê ji ji vê eşîrê hene û 54 gundê wan e û nufûsa wan 2154 kes in bi jin û mêran ve. Wek diyar e nufûsa wan lazim e ji ya di tablîtsê de heye zêdetir be.

Li qeza Beylan 17 gundê kurdên eşîra samanli, kurdên ji heman eşîrê li nehîya Kara Murt a qeza Antioxis dijin. Tevaya wan 32 gund, nufûsa wan 3778 kes in, bi jin û mêrav ve. Eşîra Elîşêr li nehîya Kara Murt, Alîşêr, Beytimurlî, Fernîs û Çigîlyancerîdî a qeza Zeytûn û li her du qezayên Pazarcikê Kuşarci û Cerîdî oymac ku bi sancaka Maraşê ve girêdayî ne. Tevaya wan 31 gund û nufûsa wan 9512 kes in bi jin û mêran ve. Eşîrê ku di listê de hebû û me peyda nekirin, bi ihtimalek xurt ji demê berê de koçer bûn, nû ber bi Rojava çûne û li wir di nava eşîrên xurt yên wîlayetê cîran de dijin. Ji wan (102.ob) du eşîrê nêzî wîlayeta Helebê Milla û Kara Kîç ku herdem dujminatî di navbera wan de hebûye li alîyê wîyalî Ferêt dijîn. Navenda eşîra Milla Wêranşehîr e û bi wîlayeta Diyarbekirê ve grêdayî ye. Serokatîya eşîra Milla kurê Îbrahîm Paşa yê meşhûr Îsmelî Beg dike, serokatîya eşîra Kara Kîlîç Xelîl Begoxlu dike, navê wî tam nizanîm. Ji kurdên din ku nêzîkî

wîlayeta Helebê ne, dikarim qala kurdê li qeza Agcadax (navê din Arka) ku li sancaka Malatya ku bi wîlayeta Xarpûtê ve girêdayî ye. Çiyayê vê qezayê ji Rojava de dighê ser qeza Elbîstanê ya sancaka Maraşê. Kurdê Akçadaxê-Kizil başî (ji vêya ez fam dikim kizilbaşê rastî ne elewî ne) lê elewî jî li vir hene ew ji kîjan eşîrê ne min fam nekir. Li vir ez dixwazim bî rizamendîya we Excellncies, hinekî ji naveroka raporê bi dûr kevim ku bala we bikşînim ne bes navên cîh û warên wîlayeta Helebê. Qeza Elbîstanê dikeve ser rîya herî nêzîk a navbera Sîvas û gelîyê Aleksanderîyê (L103)berdewamîya rê de ev navçe dikevin ser rê: Axca dags, Narhan, Elbîstan, Bazarcik ovasî, Îslahîye ovasi, Maraş, ji Maraşê diçe Gavûrdaxê Aleksanderîtû an Yomurtalik an jî Zeytûn û Hadjîn her weha Sîs a ku bi rêya 2 rojan ji dortyolê dûr e. Dikare jî bo me rojekê biqewime lazim bibe ku xwe bighînin kendava Aleksanderîyê di rêya kin a di ser Sîwasê de.

Dikarin li broşura bi înglîzî a ku ez ê bi raporê re rê dikim ku di sala 1912 de di bin navê “*Some aspects of the Italian-Turkish situation by Cam*”. Ev ne navê wî yê rast e

ev kesekî Anglo Amerîkanî ye bi navê Charles Arthur Myra ye ku berya 7-8 salan bi komîsyonekê ji hemwelatîyên xwe sardana Heleb, Musîl û Bexdadê kir. Hatibû Hespa bikire ji bo ku li Amerîka hespê erebî bi esil zêde bike û bifroşe.

Ez vegerim ser karê esas *Rapora Kurdan*. Ez xwe bextewar dibînim pêşkêşî we Excellncies, bikim. (L103 ob) Li ser ku koka kurdan û zimanê wan, ez heta nuha lê rast nehatim bi awayekî zanistî pirsar, kurd kî ne, zimanê wan û koka wan ji ku tê. Xelkê kevnare yên vê herêemê ne wek Xodzko dibêje an paşê hatine (104 ob) Li gor alim dibên her çiqas kurd bi gelek lehçan dipeyivin lê miletên Asya biçûk in bi tevayî bi du lehçên asasî dipeyivin. Ev wek berya nuha min behs kir lehça suleymanîyê û lehça asayî an kurmancî. Dîpnot: Literatûrek kurdan pir zêde nîne.

Di çîrokên kurdî yê Jaba de, navê 8 şairê wan heye teva bi kurmancî nivîsîye, her weha ew ê Xodzko jî behs dike Şêx Ehmedî (Dabîn) nivîskarê gelek şîr û poema erotîk a "Mem û Zînê." nivîsîye, Dişibe çîroka erotîk wek Leyla û Mecnûn, Ferhad û Şêrîn, Emîn Xerîb, Aşîk Kerem, Şax Îsmail û hwd. Ev her-

du lehçe ewqas naşibin hev ku dema kurdek bi kurmancî dipeyîve kurdekî Suleymanîyê jê fam nake û bilekis. kurdên wîlayeta Helebê bi tevayî li gor lêkolîn û tecruba min bi kurdîya asayî (kurmancî) dipeyîvin. Ji bo vêya bi cîh bikim, min hinek kurd ji eşîra Cûm dewet kir, yek ji wan zana bû, min ji wî rica kir ji çîrokên Jaba hinekî ji wan re bixwîne, hat diyarkirin ku bê problem teva fam kir, bes gotin şîwe ne tevayî wek a me ye, gotin di çîrokên Jaba de teesîra zimanê farisî heye. Ev pir maqûl e weha be, karmendê Jaba kurd bû (L 105) Melle Mehmûd efendî bû li Beyazîdê hatiye dunyê ku sê çarîk seet ji sînore Îranê dûr e, her weha li Tebrîzê xwendîye.

Her weha paşê jî min gelek pirsî û ji gelek mirovên cuda min fam kir ku li vê derê tev bi kurmancî dipeyivin her çuqas devokê cuda hebin jî ne ewqase ku bibe sebeb ku kurd ji hev fam nekin. Li gor agahîyên min yên bi kurmancî dipeyîvin kurdên Alaşkertê, Erzîrûmê, Bitlîsê, Wanê (Hekarî) Xarpûtê, Diyarbekirê û Musilê ne. Li du wîlayetên dawî kurdên "Zaza" ku lê dijîn, bi peyv, îfade û bi gotinên xwe cuda ne ji yên din. Her çiqas hinek zehmetî

hebe jî, kurdên li jor min behs kir (kurmanç. E.Ö) û vana ji hev fam dikin. Ya jî bo lehçê din zehmet e ku nayê famkirin, lehça Amedîyê ye a ku kurdên Bahdînan û hinek kurdên Suleymanîyê jî pê dipeyîvin. Bi tevayî em dikarin bêjin pirtûka Jaba bi zimanekî têr û zindî hatiye nivîsandin û gelek farisî têde heye. (L 105 ob)

Em werin ser têkilîyên kurdan bi yê din re bi teybetî bi miletê xiristîyan re, li vira rast ew e ku divê mirov li hinek karakterê wan ku gelekî bi miletê din re ku nîv wehşî ne dişibin hev hene wek meyla wan a li ser talana xistin, dizîkirin, di çavê wan de qimetek biçûk a jiyanî mirovan, kîndar û heyfîlanîn -Tesîra mihemedîzmê li ser mejî û ehleqê wan her weha tesîra ereb û turkan li ser wan heye (Turk her gavê dixwazin miletê mihemedî yê din berdin ser serê miletê din bi teybet xiristîyanan ji bo xwe wek mirovhez bidin rêdan û hemû guneha têxin hustê yê din). Lê awantajek kurda heye bêşik ew miletekî ji irqê Arî ye û derfet li cem wan heye ku pir rehet kultura ewrûpî hezîm bikin, evêya em nikarin ji bo turkan bêjin. Tekilîyê wan (kurdan E.Ö) bi xiristîyanan

re her çiqas hinek gazin hebin jî lê ne wek turkan tûj in li hember xiristîyanan. Dema êrîşê dibin ser gundên xiristîyanan armanca wan talan e her weha bi vî awayî ku zanibe wê çavê wan lê bibire li talanê (L106) musulmanan jî dixin.

Fanatîzma dînî em dikarin bêjin li cem wan jî xurt e (bûyerê weha bûn ku êrîşî gundê xiristîyanan kirin) tevî wê jî ne wek fanatîzma li cem turkan hişk e ku li pêşîya hemû miletê musulman xistin e, ne wek turkan zalim in, lê rastî ji bo kurdan jî xwînrijandin tişteki ne pir zehmet e wek ku çawa ji bo miletê din nîvwehşî. Kurd dikare ji bo talan an heyfê bikuje. Turk dema dike bi êş, azar û îşkencê ji pêdike û ji vêya zewqê distîne. Ez li vir ne ku kurdan diparêzim, lê her tişt relatîve (nisbeten), di kirinên kurdan de tesîra musulmantîyê û rewşa wana tê de ye heye, lê di ya turkan de tişt ji min re diyar e ev karakterekî wan yê teybet e ku teybetîyeke xwîna moxolîya ye. Dema kurd bi cîh dibe bi yek ser bi awayekî baş tê guhertin heman demê de nerînê wî û eleqedarîya wî (L 106 ob) bi der dorê wî re a ku ew wê di nav de bijî tê guhertin. Lê ku ne mihemedî be. Wek mînak berpîrsê

hêzê me yî ewlakariya hudûdê Kafkasyayê her dem pesnê yêzîdîyan dane. Kizil-baş ji xiristîyana hez dikin û ji musulmanan nefret dikin. Ew ê ku zanibe wê ji wan re bimîne bi rehetî û bê rehm kuştinê dike û dihesibîne karekî baş kiriye. Heger Kizil-baş nikaribe musulmanan bikuje, bi awayekî xerab nifira li wan û ava wan dike. Eşîrê kurdan ên ku ji xiristîyanan hez dikin jî hene, ew ê ku şopên dînê xiristîyanîyê di nav wan de hene, wek kurdên Agca-daxê. Berya nan lêxin pêşî li ser hevîr xaçekî çêdikin. Dema sunetkîrinê (kirîv) rola wê li cem kurdan jî wek li cem xiristîyana rola kiryoştî atets (Godfather. E.Ö). Li gor adetê kurdan zarok dixin dawa yekî, bi teybet divê xiristîyan be, şexsiyeta kirîv ewqas pîroz e di rêya yekî ji eşîrê dibe kirîvê tevaya eşîrê û tevaya eşîrê amade ye xwe di ber wî de bide kuştin.

Xerîta ku cihê kurdan li ser hatiye diyarkirin, di tablîtsa ku min şandiye kurd li ser esasê nehîya di wîlayeta Helebê de hatiye dabeşkirin. Wê baştir ba ku min kariba li ser xerîtê cihê kurd lê dijîn reng kiriba. Pir heyf li vir xerîtê hudûdê nehîya diyar dike nine, xerîtên weha hîn çênebûne. Ji ber wê ji bo

raporê jî min ev bi dest xist, min xwest ez pêşkeşî we Excellncies, bikim. Di xerîtê de esas cihê qeza û nehîyê wîlayeta Helebê ku eşîrê kurda lê dijîn hatiye diyarkirin. Ew cihê ku nuqta sor in, li ser xerîtê berê hebûn, lê navên ku min lê zêde kirine min bi rengê sor nivîsiye. Qeza Cebel Samana ku li bakurê Helebê dikeve wek Heleb hatiye nîşandan. Li gor salnama turkan a wîlayeta Helebê Çemê Kûek ku li ser xerîtê hatiye diyarkirin teqrîben seranserê ber vê qezayê de diherike. Merkezê nahîya min di du xerîtên turkan de dît. Resmê wan ku ji alî min de ku min di raporek din de diyar kiriye ku girêdana wana ya bi nehîyê din re çawa ye min bi salnama turkan re da ber hev û piştrast kir. Ez xwe bextewar dibînim li jêr navên hemû navend (Senter- E-Ö), qeza û nehîya ku bi ku ve girêdayîne pêşkeş bikim: Heleb (Qeza Cebel Saman); Çoban- Bey (Nehîya Îlbeklî); Kîllîs (nehîya merkezî Kîllîs); Kantara (L107 ob) (Nehîya Akca Îzzedîn); Mamlî (Nehîya Şêxler)Burc (Nehîya Cûm); Loxan (Nehîya Xezek)Î Uç Kîlîse (Nehîya Kizik); Beylan (Qeza Beylan); Kara Mûrt (Nehîye Karamûrt); Uç Kîlîse (Nehîya Evîm Axaç);

Hecî Alî (Nehîya Tekyûrlû)Kada Haydar(Nehîye Kada Haydar); Sûrûç (Qeza Sêrêç); Aram (Nehîya Bazikî); Çardar (Nehîye Reşî); Kara-Kûyû (Nehîya Merzaman); Kûlaguzlû (Nehîya Nadirlû); Ûksek (Yuksek E.Ö)-(Nehîya Camûstîl); Eni Beyan (Yenî Beyan.E.Ö) (nehîye Xartaleb); Eni Beyan (Yenî Beyan E.Ö), (Enîce (Yenice E.Ö) kale); Çolyû (Nahîya Şeker-oba); Koçabad (Nehîya Koçabad); Zeytûn (Nehîya nav-endî Zeytûn); Kara Tût (Nehûya Kara Tût); Alîşêr (Nehîya Alîşêr); Bay Tîmûrlî (Nehîya Bay Tîmûrlî); Fernîs (Nehîya Fernîs); Çîgîlyan (Nehîya Çîgîlyan); Orî (Nehîya Kûşçî Cerîdî); Agçalar (Nehîya Atmalî (Etmalî.E.Ö); Alî beyşagli (Alî bey ûşaxi.E.Ö) (Nehîya Baçe-Atmanlî-Sînîminlî); Bagdîn Kebîr (Nehîya Etraf-Bazardîk); Yoksûn (Nehîye Yoksûn); Selmanlî (Nehîya Ûfaçikli) Û Kara Îsmail (Nehîya Mûsa -Beklî).

Konsul:V.V. Fon Sîmerman  
29 Temmuz 1913

Belgeyên bi raporê re (L108-117) bi dokumentêre A.

Tablitsa kurdên niştecih û yên demki a sancaka Ûrfayê ya wîlayeta Helebê.

Ev tablîtsa ji xebateke hîn nehatiye weşandin a niştecihî Helebê ya Şêx Kamil Gûzzi ye. Bi dilxweşî bes bi şert pêşkêşî Konsulê Împaratorîyê kir, ji bo bikaranîna van materyalana. Lazime mafê wi yê nivîskarîyê neyê îhlal kirin. Divê heta ew ne weşîne ev materyalana ji bo publikê (raya giştî) neyê belavkirin. Heta ew ne weşîne, bes ji bo der dorê teng kesên eleqedar bê bikaranîn.

(L. 109) kalona pêşin navê ci-han bi transkrîptsa turkîye ji dawî ya yekê li jêr e wek mînak listek tenê ji tablîtsê ye.

| Trankrípsya rusîA navê cihan       | Mal | Zilam | Jin | Tevayî |
|------------------------------------|-----|-------|-----|--------|
| Qeza Cebel Saman a Wîlayeta Helebê |     |       |     |        |
| Başsemra                           | 9   | 17    | 20  | 37     |
| El-zûk-el-kisbîr                   | 20  | 25    | 47  | 72     |
| Birc-ûl-kazz                       | 4   | 8     | 16  | 24     |
| Basûfan                            | 17  | 38    | 46  | 84     |

|                             |    |    |    |     |
|-----------------------------|----|----|----|-----|
| Birc-Heyder                 | 6  | 9  | 5  | 12  |
| Kefer Nabo                  | 3  | 7  | 22 | 38  |
| Sogane                      | 8  | 16 | 22 | 38  |
| Berad                       | 7  | 13 | 20 | 33  |
| Nehîya Îlbekalî a Qeza Babê |    |    |    |     |
| Sandî                       | 33 | 69 | 90 | 159 |
| Kurçî -xûlok                | 11 | 22 | 22 | 44  |
| Zîlîf                       | 10 | 28 | 28 | 56  |
| Kazîlar                     | 14 | 34 | 32 | 66  |
| Arap-gezî                   | 32 | 40 | 49 | 89  |
| Karaca-veren                | 1  | 5  | 11 | 16  |
| Kara-koz                    | 7  | 15 | 9  | 24  |
| Oca-kûyê                    | 8  | 15 | 16 | 31  |
| Înkilab                     | 18 | 33 | 28 | 61  |
| Çanaklî                     | 5  | 10 | 10 | 20  |
| Beykerbekî                  | 34 | 61 | 63 | 124 |
| Eyşa                        | 15 | 28 | 40 | 68  |
| Kûz-yaşî                    | 4  | 3  | 12 | 15  |
| Zogra                       | 2  | 2  | 5  | 7   |
| Xelman                      | 9  | 13 | 17 | 30  |
| Tel-el-Şair                 | 4  | 4  | 7  | 11  |
| Bûldûk                      | 2  | 4  | 8  | 12  |
| Kara-yakûb                  | 3  | 5  | 5  | 10  |
| Kalranlî                    | 5  | 5  | 11 | 16  |

Nîşanê Tablîtsê (L109) Qeza Cebel saman (Navê din Cebel leymûn). Ev Qeza di salnama turkan de dabeşî nehîya nebûye. Merkeza wê ya îdarî muweqet nuha bajarê Helebê ye. Li vê Qezayê li gor salname (Almanaxa) hukûmetê a sala 1324 hîcrî 113 gundê wê heye û 25 060 nufûsa wê ya bi jin û mêran, ji vana bes 8 gund bi 74 malan ku nufûsa wan 315 kes bi jin û mêran ve kurdên Yêzîdî ne ji eşîra Şiravîn e 2 bi kurdî û erebî dipeyîvin (Bi turkî nizanin) karê çandinîyê (Zîreet E.Ö) dikin.



| TrankrîpsyaRusî A navê cihan | Mal | Zilam | Jin | Tevayî |
|------------------------------|-----|-------|-----|--------|
| Mûkbîls                      | 8   | 9     | 17  | 26     |
| Şûbeyb                       | 3   | 6     | 7   | 13     |
| Sîlcsîlc                     | 1   | 2     | 2   | 4      |
| Kaya-Turkmen                 | 3   | 4     | 5   | 9      |
| Kîlîs                        | 2   | 2     | 2   | 4      |
| Yûsêf-bek                    | 2   | 2     | 3   | 5      |
| Lyûls                        | 1   | 1     | 1   | 2      |
| Bab-leymûn                   | 20  | 45    | 51  | 97     |
| Taş-kûyû                     | 23  | 63    | 58  | 121    |
| Mamlî                        | 6   | 18    | 18  | 36     |
| Ekyûz-Eldyûran               | 4   | 10    | 4   | 14     |
| Çortan-Xyûk                  | 26  | 48    | 64  | 112    |
| Îslaxîler                    | 32  | 59    | 48  | 107    |
| Arap-çorlîrk                 | 5   | 10    | 14  | 24     |
| Şavî                         | 26  | 48    | 64  | 112    |
| Tel-Ayşş                     | 26  | 41    | 54  | 95     |
| Kab-veren                    | 1   | 18    | 13  | 31     |
| Kajkûm                       | 26  | 61    | 68  | 129    |
| Kîrk-megara                  | 3   | 5     | 6   | 11     |
| Eşekçê                       | 4   | 5     | 4   | 9      |
| Kûz-yaşîk                    | 4   | 2     | 5   | 7      |
| Boz-Xûlok                    | 2   | 2     | 5   | 7      |
| Zogra                        | 2   | 2     | 5   | 7      |
| Bel-veren                    | 4   | 4     | 7   | 11     |
| Kara-kûlû                    | 5   | 4     | 10  | 14     |
| Eyn-El-Beyda                 | 2   | 5     | 3   | 8      |
| Çûkûr-veren                  | 1   | 2     | 2   | 4      |
| Kara-taşli                   | 5   | 5     | 14  | 19     |
| Keçelî                       | 1   | 2     | 4   | 6      |
| Deve-xûlok                   | 7   | 7     | 11  | 18     |
| Baltacik                     | 4   | 5     | 3   | 8      |
| Hecî faklî                   | 2   | 4     | 2   | 6      |
| Kenderîs                     | 2   | 2     | 22  | 4      |
| Deknsk                       | 1   | 15    |     | 3      |
| Xûlû-oglu                    | 3   | 3     | 20  | 8      |
| Ez-ziyars                    | 6   | 23    | 47  | 43     |
| Kodcarli                     | 19  | 48    | 48  | 95     |

Hemû nufûsa din a vê qezayê-mehemedî ne. Qeza Bab-nehîya Îlbekî. Li gor Şêx Kamil nufûsa vê nehîyê bi teveyî kurd in bi navê heman eşîrê (Îlbekî.E.Ö). Li tablîtsê, li wir 57 gund 528 mal nufûsa wan 2152 kes in bi jin û mêran ve. Li gor salnama turkan li vê nehîyê 87 gund in. Tê wê wateyê 30 gund zêde ne, li gor hesabê ku min di tablîtsê de kirin 24 mal dibe 119 mirov, bi jin û mêran ve. Ew dibe 720 mal û nufûsa wan dibe 3570 kes bi jin û mêran ve. Ev kurd tev mehemedî û nişteci ne (Avtahntonin. E.Ö) cotkarîyê dikin. Baş nehat famkirin ev dikevin nava kîjan gruba kurdan. Nehîya navendî ya qeza Kilîsê. Ev nehîye nufûsa wê tevlihev e. Kurd li mintqê çiya dijîn. Turk û ereb li jêr dijîn. Min nakarîbû baş fam bikira ka çiqas in. Di salnamê de min nerî di wir de jî nufûsa wan ne hatiye diyarkirin. Li gor tablîtsê 8 gundê kurda ne, 200 mal in. Nufûsa wan 1100 bi jin û mêran ve. Ew mehemedî ne û (L 109 ob) ji eşîra Îsedîn in (Êlek eşîra Okça Îzzedîne), Niştecîne (Avtahntonin. E.Ö) cotkarî û cenanîyê dikin, bi kurdî û erebî dipeyîvin. Nehîya Okça Îzzedîn a heman Qezayê. Nehîye tev kurd in û nehîyê navê

xwe ji navê eşîrê girtiye. Hejmara gund û nufûsa vê nehîyê ya tablîtsê û salnama wîlayeta Helebê li hev tê. Bi teveyî li vê nehîyê 32 gund hene. 826 mal in nufûsa wan 5 176 kes in bi jin û mêren ve (Li gor vê tablîtsê). Nişteci ne (Avtahntonin. E.Ö) cotkarîyê dikin û pez xwedî dikin, mehemedî ne û bi kurdî û erebî dipeyîvin. Nehîya Mûsa-Bekî a heman qezayê di dawîya tablîtsê de ye.

Nehîya heman qezayê Şêxler tev ji eşîra şêxanlî an şêxler in. A ku navê xwe li nehîyê kirine. Bi teveyî kurd in. Li gor tablîtsê 50 gund in. 1286 mal in û 860 nufûsa wan bi jin û mêran ve. Li gor Şêx Kamil hemû mehemedî ne. Karê cotkarî û cenanîyê dikin. Di tablîtsê de 6 gundê vê nehîyê ji a salnamê bêhtir in. Lê navên gundan di tablîtsê û salnamê de wek hev in. Ew bi kurdî û erebî dipeyîvin. (L. 110) Nehîya Çûm (Cûm) a heman qezayê li gor agahîyên Şêx Kamil tev kurd in bi heman navê eşîrê. Li gor tablîtsê 50 gund in. 934 mal in. Nufûsa wan 9317 ye bi jin û mêran ve. Wek yê li jor hatîne diyarkirin ew jî karê cotkarî û cenanîyê dikin. Bi kurdî û erebî dipeyîvin. Ew ne yêzîdî ne, mehemedî ne. Muqayesa bi sal-

nama turkan re 32 gund zêde ye. Heger li hesabê ku min li jor kiribû (hesabê ku 24 mal li ser 119 kesan bi jin û mêran) wê demê dibe 768 mal. Nufûsa wan dibe 3806 kes bi jin û mêran ve. Navê di tablîtsê û salnamê de wek hev in. (L. 110ob) Nehîya Xezek a qeza Entabê, tev kurd in û tev li hev bûne ji xezek û kizika pek tê. Nehîyê navê xwe ji eşîra ku di bajêr de ye stendîye. 30 gund in 1103 mal in, nufûsa wê 6855 kes bi jin û mêra ve, dînê wan mehemedî ye, karê cenaniyê dîkin (bi teybet fisteqa diçînin). Bi kurdî û erebî dipeyîvin. Di salnamê de jî nav û hejmara van gundan wek hev in. Nehîya Kizika heman qezayê di dawîya tablîtsê de bi cîh bûye. Qeza Beylana sancaka Helebê. Dabeşî nehîyê nebûye.

**P.S.** Ev dokument min ji zûde dema li arşîvên АБПН (Arşîva siyaseta derve a Împaratoriye), qesd Împaratoriya Rûsyayî de dixebitîm min derxistibû. Wan rojan min arşîvên li cem min hinekî tesnîf dikirin ber çavê min ket. Û min rast dit ku lazim e wergere kurdî û min ji rûst wergeran kurdî. Kerem bikin!

## Bêje bêje

Çiya bi çiya ez gerandim  
Keçê dînê te ez westandim  
Xewa giran da ez herimandim  
Dil û gurçikê min qerimandin

Bêje bêje hevalo bêje  
Yara min ra rast bibêje  
Ne şeva'm hey ne jî roj e  
Wê ez kîrim dîn û gêje

Arê şevan gîjegîj e  
Remê ser te da kilaman dibêje  
Kes nikare vî dilî bikuje  
Dilberê tu yê min bikuje

Bêje bêje hevalo bêje  
Yara min ra rast bibêje  
Ne şeva'm hey ne jî roj e  
Wê ez kîrim dîn û gêje

Keçê li vir bar mekî  
Qala kalê xelkê mekî  
Dilê xwe ji min sar mekî  
Vî warî li min reş mekî

Bêje bêje hevalo bêje  
Yara min ra rast bibêje  
Ne şeva'm hey ne jî roj e  
Wê ez kîrim dîn û gêje

**Mîr Remê Hêlkeçik**

# Xalisînan (ODABAŞI)- Yunak/Konya

## Abdulgazi Xalisînan

Gundî me di sala 1895an da ava bûye û navê gund Xalisînan ji xalî Sînan û xalî Hüseynin tê.

Mazinên gundî Sakka (Ishakuşağı) dibêjin; em canbegên gawestî ne û Isak û Sînan jî du bira bûne.

Li Şiroyê (Pötürge) jî gundekî bi navî Isakuşağı û dîsa li Yazihanê jî gundê bi navî Sinanlı heye.

Va gundana bi Ishakuşağı û Sinanlıya Yunakê va çî alaqaqên xwe hene em nizanin. Gere merî baş lê bipirse.

Xalisînan û gundê din ên canbegan li dora Akgölê ne. Li Yunakê jî va gundana ra, gundê çama (çema) dabêjine. Lê va gola nika miçiqîye.

### Malbatên ku gund ava kirine ev in;

- 1-Bera Hecîlera (Haciler sülalesi)
- 2-Bera Îsmailîya (İsmailler sülalesi)
- 3-Bera malê Silê (Süleymanlar sülalesi)

Ber yan jî sulalên din paşê hatine. Hin kes dibêjin ew bi turkmenan va hev nekirine û turkmen çûne gundê Yigar Tahutlu ava kirine.

Prof. Kazım Ürün di kitaba xwe ya „Yunak tarihi“ da dibêje ku canbegên gawestîyan di 1744an de bi fermana dewleta Osmanî goçek mezin bûye. Canbegan bi sarokê xwe Mîr Alîşan Beg va mala xwe bar kirine û hatine Anatolîyê. Seyyahek (Carsten Niebuhr) dibêje 10000 kon hebûne. Kerîyê xwe dane ber xwe çêrandine û hatine Ankarayê, Konyayê û Eskişehirê. Piştra li dorî çemî Sakarya, Sivrihisar, Çeltik û gundî Sixircik û Buzlucayê jî wir jî hatine Karataşê. Gayên xwe westiyane û li wir konên xwe vedane. Camî çêkirine. Kanî çêkirine. Li ser

---

*Jêrenota Birnebûnê: Di arşiva TCyê da bi tev canbegan qala kurdên Sinanlıyê jî derbas dibe, ku pêşta li Rakkayê îskan bûne û ew dûra ji wir reviyane û li Erguvan, Divrik û Xarputê belav bûne. Piştî îskana mecbûrî ya di sala 1744an da komek ji wana li Konyayê, qezaya Yunakê hatine bicîhkirin. Ji nivîsa Abdulgazi Xalisînan da em jê derdixin ku gundê Sinanlıyan li Anatolîyayê ev in; Odabaşı (Xalisîna), Ishakuşağı (Sakka), Sinanlı (Sinayê Şuşê). Di arşivan da dîsa qala sinanlıyên turkmen jî derbas dibe, ji wana komek piştî kuştina mêrên wana, jin û zarok qasî 800 kes di sala 1800î de hatine îskankirin, şandine girava Kibrisê.*



kaniyê nivîs hebûye. Dûra li gunda belav bûne. Her berekê, malekê gundek ava kirine.

Alîşan begekî pir mezin bûye. Konya, Ankara, Eskişehir heta Çorumê tesîra xwe hebûye. Rahmetî mezelê xwe li Çeltikê ye. Navî nevîyên wî li Çeltikê bi paşnavê „*Kökten*“ in. Li dû vê koçê hinek kurmanc ber bi Kütahya, Çanakkale û heta balkanan çûne.

Gund di salên 1980-1990î da ji bo sedema debara xwe, sewa ku bixwînin û gedên xwe seneat hu bikin bar kirine çûne bajaran û Ewropayê. Li Yunak, Akşehir, Konya, Polatlı û Eskişehirê bi cîh bûne. Yên ku pêşta çûn zorî kişandin. Quşaxê paşê entegre bûn. Biharan

tên welatî (memleketî) xwe û dol û dawetên xwe dikin. Nas û dostan dibînin. Tiştî ji vira hildigrên û terin, ekonomîyê jî gur dikin. Naxta (niha) pir nên. Li welatên Ewropayê dol û dawetên xwe dikine.

Di van 20 salên dawî de ji gund pir barkirin heye. Ji 140-160 mala naxta 25-35 mane.

Xalisîna bi gundî Küçükhasan, Adakasım, Karayayla, Hacifakılı va ciran e. Ji Yunakê 21 km, ji Akşehirê 85 km û ji Konyayê jî 195 km dûr e. Ji rêya Yunak -Ankarayê 8 km, ji Küçükhasan 5 km. dûr e. Gencîya me de wasita tunebûn.

Di şerê Çanakkaleyê de şehîdên me jî hene. Xwadê lê razî be, kovarê Bîrnebûnê ew gî yazmîş kirine.

H:1297 (1881) Abdulkadir,  
kurê Mehmet şehid: 16.9.1915

H:1307(1891) İzzet kurê Meh-  
met şehîd: 27.5.1915

Xalê dayîka min, ji gundê  
Sakka (Ishakuşagi) jî li wê derê şe-  
hid ketiye. Ji Xalisînana ji sulala  
Îsmâîla lawê Rustem Abdil şarap-  
nel lêketiye. Ev jî gazî bûye. Yasaya  
paşnavan (Soyadı kanunu) wê çaxê  
bûye bona wê em hinekan nizanine.

### **Bûyereka dilşewat**

Hecî Mistefa yek kesê ku gundê  
Xalisînan avakirî ye. Birê xwe  
Odabaşî ji eskarê hatiye. Hin di-  
bêjin, belkî fîrar kirîye. Ew baş ni-  
zanîn. Esker hatine mala mixtarê  
gund Hecî Mistafê. Mixtar esker  
mêvan kiriye. Odabaşî jî şandîye  
paşîyê gund.

Gotine xwe veşêrin. Esker li dor  
paşîya gund li Odabaşî gerîyane.  
Odabaşî nav saz û cîlan da bûye.  
Eskeran guman lê kirine û ew qur-  
şin kirine. Merîyên gund gotine,  
Odabaşî şunê xwa biguhare. Lê  
belê hezar cara heyf, Odabaşî ha-  
tiye lêxistinê û mirîye. Jenderma ji  
Hecî Mistefê re gotine; te çima ji  
me re negot, belkî me lênedixist.

Jinika Odabaşî li ser mêrikî xwe  
ev klama gotiye;

*Odabaşî Odabaşî,*

*Sazo, sazo sar e*

*Muhafîza têna karşî karşî*

*Odabaşî kuştin li paş mala ne*

*Me te ra go ê li te xin*

*Ba riye de darxistin,*

*Murfezaci kolbaşî*

*Kîsikî pera ne*

**Mezinê gund:** Hecî Mistefa gund  
ava kirîye. Mehmet Efendi, mezelê  
wî di goristana gund da wek tirbe ye.

**Pehlivanê gund:** Celal Uçar, ji ma-  
la Süleymana İpek e.

**İbişko,** ji bera Süleymanlara, li  
Konyayê alîkarê walî bû. Navê bi-  
rayê wî yî mezin li Konyayê taxa  
Zafer/Zindankaleyê wek „*Gemal-  
maz sokağî*“ dane kolanekê.

**İzzet Baysal:** 1970an da li Amerîkayê  
xwendîye û li wir bûye karmend. Ew  
merikî pir xêrxwaz bû ye.

**Ferhan Ballı:** Cara pêşin wî ji gund  
Fakulte xwendîye û bûye mu-  
hendîz û bûye serokê bajarê  
Akşehir.

**Mehmet Tekin û Mehmet Tayat**  
dermanfiroş in.

**İsmail Kılıç:** Hüseyin Köse ma-  
moste bûn.

**Bayram Odabaşî** doktor û birangê  
wî **Alî Odabaşî** jî Ziraat Mühendîsî  
bûn.

Ji sala 2000an şûnda merîyên gund pira xwandin. Avukat, subay, polis, karmend û mutahîd derketin.

### **Muxtarên gund**

Hacî Gürlek, Celal Uçar, Hacı Tekin, Hacı Kadir Güler.

1972-1986 Rahmi Ağaoğlu.

1986-1986 Yusuf Yüksel.

1996-2009 Mustafa Beyoğlu.

2009-2014 Bünyamin Güler.

**Kewanî:** Di xortaniya me da xaltiya Medîne (türkmen) kewanîya baş bû.

**Şare:** Meyra Boz, Têla Besê

**Bilûrvan:** Celal Uçar, Hasan Durmuş, Xalî Kurreş pir rind bilûr lêdixistin.

**Pêhlîwan:** Ji sulala (bera) Îsmailan Pêhlîwan Abdil, kalê Celal Hamit Uçar e, ji dewleta Osmanî sancak hilgirtiye. Îpaş Pevlon (Pehlivan) ji sulala Süleymanlera bûye. Pir delal bûye. Li eskerê mirîye.

**Dengbêj:** Osmanî Kirsas, Şah İsmailî Kirsas ji gundi Karayayleyê.

### **Tucarî**

Li dol û daweta zengina turaciya baş tanîn(dianin). Dol pir şên dibû.

### **Neçîrvan (avci)**

Xalê Dewrêş mavzer rind tavit (diavêt). Bavî min Şixo ji mavzer rind nîşan digirt. Kûçikên har ji dûr ve bi mavzerê ve lêdixistiye.

**Henekcî (hengcî):** Îsmalê Hesikê, Şixoyê Menê.

### **Nanê dolê**

Dolên berê wextak ku dihatin dawetê bi xwe re pez, saçî dihanîn. Xwedanî dolê pez şerjê dikir.

### **Xwarina dolê/dawatê**

Şorba dêw, goştê pêz, şîva bulgur, xoşav, bogircên (fasulîyên) sîrkirî û hevleya gevr (helawa gewr).

### **Navên xarina**

Kurmanc goşt pir dixwin. Hela goştî berxa bû xêr e. Topik, kurtsîr, hevîrî sîr, cimcimik (manti), papara, germanûr, aşûre, hevleya reş (helawa êrd), xoşmari, keşkek, kîjkîj, qatmer, kilor û nanî sêlê pir lêdixistin.

1966an me ji gund bar kir, hîn camîya kevn habû. Berê paşîyi (paşgund) gund dîsa camî hebûye. Camî nêzikî mala me bû. Me mîlle nas dikir. Biharê okul tatîl dibûn, em diçûn ber xoce û Kur'an hu dikir. Têye bîra min Îsmet Xoce bi telebên xwe ve sewê duaya baranê



bi 70 hezar kevirên çaqil *Laila-heillallah* dixwendin. Îsmet Xoce rehmetî telebe didan falaqê jî, me ew dî. Rojîyê mîlet bi dorê fitar didan. Teravîya gî bi hev ra bi lambên lux va dihatin, şên dibû.

Mektep di wexta Menderes da vebîye. Min di 1966-1967an da li mektebê sinifa pêncxa xwend. Pêş me li mekteba kurmancî qedexa bûye.

### Debara gund

Rênçberî, ziraat, pez-berx xwedîkirin, ajotvanî.

Axa şivan digirtin, cirana pezê xwe tevê dikirin. Canbega pez û berxên xwe dibirine Îstembulê û Ankarayê difirotime. Me berxên xwe difrotin Hamit Kart. Ewî jî Încovê bû û li Îstembulê tucarî dikir.

Rênçbera genim û ce diçandin. Motor derket, reçberî jî pir bû. Biçercilik hat. 1975an dîv (pêncar), kimyon, dandikên rûn, qumpîr (qartol), anason jî diçandin. Kurmanc kamyon û tircilixî pir dikin. Li gund zewî pir in, zengîn in.

**Navê heşinayî:** Genim, ce, yulaf, çevder, mısır, bogirce, nok, nîsk, anason, qumpîr, pîzav (pîvaz), bos-tan, qavûn (kelek), qarpûz (zeweş), kiriş, çitlik, takircan, xalîsorik, ba-baça, gûzik, tokli, kangal, gizêrê

erdê, kivkarik. Sala ku baran pir bû xire; dombala (kumî) pir dibe.

Navê ajalan/heywanan: yaban ordek, qaz, toy, kergî, rîvî, gur, domiz, leylek, mar, kelbizan, kusi, beq, gogerçîn (kevok), sıgırcık, serçe, karabatak, masîyê sazan. Zivistanê gol cemidî xire bi zipkinê masî digirtin.

### Erf edet, rûsim û lîstikên zarya:

Li gund edetê berê teqîbê dikin. Mesela; xazgincî nîşan, şerbet, çerez (kakil), nîşan pêva kirin, Dol/dawet royê perşembê dest pê dike, bazarê xilas dibe. Dolê oxuntuya dawetê, 3-4 jin û gede bi dolcî va li nav gund digerin û diwêjin; dola me heye werin qehweka me vexin. Şemiyê nanî dolê didin. Saçiya ku oxuntiya anîn, qasî 10-15 pezî şarjê dikin. Kewanî pezî şerjê be dibin mala bûkê. Roya bazarê hêla keçikê nanî dolê hazir dikin. Bûkê hildigirin diwin hêla lêwîk, li wir dîsa nan dixun, dilîzin. Berê tura gilaş hebû.

Berî ku xort herin eskerîyê li ber camîyê xoce dua dike û wana dişînin.

Ciran bi hev ra pir hurmetkar bûn. Mîna merîyê hev bûn. Jinan jî herî vediçirandin. Teşî dîristin. Bend, gore, cil, çal (deng) dihûnandin.

Keçika çeyiz, tevn, tentene, kanavîçe çêdikirin, xalîyê hevrişim



|    |        |                 |                 |      |      |
|----|--------|-----------------|-----------------|------|------|
| 13 | ولایتی | جہانگیر علی خان | تاریخ مولیٰ     | ۱۶۰۶ | ۱۶۰۶ |
|    | ولایتی | محمد            | تاریخ اربعین    | ۱۶۰۶ | ۱۶۰۶ |
|    | ولایتی | افضل            | جہانگیر علی خان | ۱۶۰۶ | ۱۶۰۶ |
|    | ولایتی | ارشد علی خان    | اولیٰ بنو دہلی  | ۱۶۰۶ | ۱۶۰۶ |
|    | ولایتی | ۶۶              | مکانات و ہجرات  | ۱۶۰۶ | ۱۶۰۶ |

Harputlu oğullarından Ömer oğlu ..., Odabasi

Harpumlu oğullarından Ömer oğlu ..., Odabası

[illegible]

İsmail oğullarından İsmail oğlu Mehmet, Odabaşı



|               |          |                    |            |
|---------------|----------|--------------------|------------|
| لبن           | اگر چه   | فرماند و در آن آلا | روغن ادرک  |
| چربی لبن      | چربی لبن | نار و زیتون        | فلفل سیاه  |
| و شیر         |          | نوع دسوی           | اود و شیر  |
| ولا به و شیر  | فلفل     | نوع تر جیبی        | ا. ۱       |
| غذا و دسوی    | افش      | سبب و دسوی         | ا. ۲       |
| فرماند و دسوی | ا. ۱     | اولی و دسوی        | پاد و دسوی |

Boynunca oğullarından Ahmet oğlu İbrahim, Odabaşı



|               |      |                      |               |
|---------------|------|----------------------|---------------|
| اسم           | محمد | ان ارادولر قو الايلى | اسم           |
| جاري اسم      | محمد | طابور و يلك          | جاري اسم      |
| وليد          | محمد | دارع دسولى           | وليد          |
| ولادت و متاهل | محمد | دارع ترحيمى          | ولادت و متاهل |
| نسل و اولادى  | محمد | ميرزا محمد و متاهل   | نسل و اولادى  |
| اولادى        | محمد | اولادى و متاهل       | اولادى        |

El Ali oğullarından Abdurrahman oğlu Ahmet, Odabasi

Kel Ali oğullarından Abdurrahman oğlu Ahmet, Odabası

dihûnandin. Kurmanc, klamê xwe tim bi şewat in. Li şînan, şare distirên. Li dolên xwe da awê govandê dibêjin. Govandê me vana ne: Sêgavî, seyran, lorkê, zariye, meyremê.

**Zirnevan Memed**, dolcî Hüseyin li Serîgolê rûdiniştin. E herî meşhûr Koso bû.

Li gund merîyê dewletî oda xwe hebû. Li vir top dibûn û sohbet dikirin. Yekî xelk hat li odê radiket. Li gundî me berê oda malî Hacı Mistafê û oda malî Olçîci hebîye.

Xenzûrî min ji gundî Yüzükbaşı qal dikir; wexta tirk ji gundi Sivrihisarê diçûne gola xê (Tuz gölü) li gundî Yüzükbaşı di oda da dibûne nîvan. Kurmanca li nîvana hez dikirin. Yekî Yüzükbaşiyê çûye gundî Sivrihisarê. Li odê berev bûne. Yekî salmezin hatiye, kesik li ber ranebûye, kurmanc î ji Yüzükbaşiyê rabiye pê. Ew î mezin merîyê xwe ra gotiye;

*Şu kürtlere bakın, ne kadar saygılılar! Ama sizde saygı yok. Bak adam misafir, kalkıp bana yer verdi!*

(Mêrik ji gundiye xwe ra gotiye: Binêrin, kurmanc çiqas hurmetkar û rêzdar in, ew mîvan e, ji ber min rabû, lê ji we tu kesek ranebû!)

Xidirlez hatina biharê ye. Danî, bijarik çêdikirin li ser çayirê duxarin. Li barge ser çayirê manê digotin.

Biharê bi hev ra pez diqusandin, xwedanî pêz berxik şerjê dikir, xoşmarî û helawa êrd çêdikirin, ziyafet didan. Xerman jî şên dibû. Zewî bi biçerê diçînîn. Bi moto- ra va genim û ce diqşandin şûna xermanê. Xerman bi duganê dajotin. Paşê patos derket. Bi wê ka dihêrandin.

Kurmanc navan kin dikin û pir kesa jî navekî din jî lê dikin. We- ka Memo, Hamo, Silo, Hacı, Şixo, Ommo, Huso, Como, Reşo, Sebo Bello, Beko.

Laqap: Çelhezar, Gökbaş, Kur- reş, Akkaş, İpaş, Olçîci, Memik, Kakkaso.

**Navê jinan:** Fati, Tati, Eti, Satê, Ayşo, Bodê, Pemê, Kifê, Dudu, Ossî, Xwcê, Topê, Zarê, Canê, Kewê.

Li gund kurmancî bi devoka canbega deng dikin. Li mala piranî kurmancî dibêjin. Naxta bi gedên xwe ra bi tirkî deng dikine. Gencî me tirkî hîn pir dibêjine. Zimanî xwe jî bîr nakine. Ekî çûne ba- jaran kurmancîyê fêhm dikin lê dengkirinê şenakine.

## Hêjmara gund

| <u>Sal</u> | <u>kes</u> |
|------------|------------|
| 1997       | 654        |
| 2000       | 619        |
| 2007       | 500        |
| 2012       | 470        |

**Lîstikên berê:** Govend, bazdan, qamçi yanê tura pêlewanî û çînderxistin. Xort diketin delxî keçikan, yekî du keçik dida lîstin. Xorta ew keçikana direvandin, millet pê dikenîyan. Di daweta da beyraq (al) direvandin.

## Lîstikên geda (zarya)

Qint, hingirme, veşortek, tîztîzika Apî Omer, gistîr veşartin.

## Bûka Baranê

Wexta baran nedibarî, bûka baranê dilîstin. Li malan tişt berhev dikirin, şîv çêdikirin û dixwarin.

## Mezra/bargiyên (yayla) gund

- 1- Dambasan sertler
- 2- Türkmenler
- 3- Çolaklar Deliraşit
- 4- Ballar
- 5- Bargi jîrî Aşağı yayla.
- 6- Pederler
- 7- Olçiçi Baysalar
- 8- Bekarlar
- 9- Sarraçlar
- 10- Köseler
- 11- Ali bey yaylası
- 12- Hamiççeler
- 13- Hatap
- 14- Hacisakka Tekinler

## Qerfo

Stîleke nu ye. Bêhed, bêsansur û otosansur e. Rexne û henek in. Bêtirs in, lê zik û hîsên kesî naêşînin. Çav û mejo vekirîye.

Seyfi Doğan

roja newrozê  
ayîna  
îlahîyên siyasetmedaran

li malên  
siyasetmedaran  
nêynik nabin

zikekî têr yekî birçî  
bi şukirkirin û şukirkirinê  
zimanên di dev da qilot bûna

ji bacê  
dûmanî derdikevê  
di war da agir nîne

heger bêrên gul nexware  
girîk şivan  
ji xanimê xwe re biba

cînavîz  
bêhndirîyêk genim da me  
lê çin jî ji me koz kirin

hengiv dixwuna  
mêşê tê re kir jî  
xwe hel tawêna

xwe li ser kursîyê motir  
wang pankiri bû  
fîrîskîyê jê kêmbû

xwezi vê şevê  
bavê te li derve bima  
barî me yê sivik bû biya

wênekî tarî  
çarçeve ke  
ji zêr

# Nêrînek ji Celîkan li peyvên magî, lur û hur

Ecevit Yıldırım

Di nav civata me de bêtî ku mane  
û wateya wan bê zanîn çend peyv  
tên bikar anîn.

Yek ji wan jî peyva „magî“ ye.

Dema xortaniya xwe gelek cara  
li ser peyva magî fikirîbûm.

Li gundê me Celîkan, emirme-  
zinekî ku min jê pîrsa peyva magî  
nekiribû hema bêje nemabû.

Di nava wan de hinek kesan  
ji bilî kurmançî tu zimanekî din  
nizanîbûn.

Lê dîsa jî kesekî ku bikaribe ber-  
siveke bo vê pîrsê bide derneketibû.

Gava piştî çend sala ez fêr bûm,  
ku peyva magî xwe dispêre serde-  
ma bav û kalên kurdan medan û  
ola wan zerdeştîyê ez mat mabûm.

Berî ku ez di derheqê koka peyva  
magî de dîtînen xwe vebêjim, dix-  
wazim li ser şiklê gotina peyva magî  
çend mînak û agahdariyan bidim.

Peyva magî herdem ji bo ku  
halekî negatîf îfade bike tê bikaranîn.

Mînak; Magî pîs, magî dînik,  
magî virek û hwd.

Bi qasî ku heta niha min tespît  
kiriye, peyv tenê ji hêla kurdên

Anatolîyayê û her wiha ji hêla  
kurdên ku girêdayî mezheba hanefî  
ve tê bikar anîn.

Peyv ji hêla mêran ve tê bikaranîn.

Heta niha min neditiye ku civa-  
teke ku derveyî me vê peyva magî  
bi kar tîne.

## Magî û çend taybetmendiyên

wan;

Xizaniya me kurdan ya di warê  
sazîbûnê de tê zanîn.

Îradeyeke ku bikaribe kar û xe-  
bateke rêk û pêk di vî warî de bike  
jî tune.

Ji ber vê yekê ez ê analîz û  
şîroveyeke spartî çavkaniyên biyanî  
yên di dest de heyî bikim.

Di serî de divê ez îfade bikim,  
ku daneyên heyî me dibin ser-  
dema medan. Ji wir tê zanîn, ku  
magî eşîreke medan ya sereke bûn.  
Her wiha eşîra magî ji ayînên dînê  
zerdeştîyê jî berpirsiyar bûn û pola  
rihbanan jî ji wan pêk dihat.

Di çavkaniyên yunanîya kevin  
de peyva magî wek magos/magus  
derbas dibe.

Ev peyv ji ber ku di zimanê erebî de tîpa „g“ tineye, wek „mecûsî“ derbas bûye.

Peyva ku orîjinal halê xwe „magî“ ye di dema sasaniyan de wek „Magwupatî= Magbedan û Mawbedan hatiye bikar anîn. Pişt re jî di çavkaniyên erebî de jî bi şiklê mawbed yan jî mûbed hatiye gotin.

Çend taybetmendî û wezîfeyên magiyan em dikarin bi vî awayî rêz bikin:

1. Berpirsiyartiya ji ayînan. Ji wan re mabedan/mubed jî dihate gotin. Di dema sasaniyan de ew xwedî meqama herî bilind bûn. Merî dikare wan bi meqama papatiya di dînê xristiyanîyê de miqayese bike.
2. Ji berpirsiyarên ku bo agirê pîroz her vêketî bimîne re „Harbed“ dihate gotin. Bi kurdiya îro merî dikane wek „Arbed“ jî bi lêv bike.
3. Parastina perestgehê. Ji berpirsiyarên parastina perestgehê re Bermog dihate gotin.
4. Magî ji prosedur û mersîma dema mirî û meyîtan jî berpirsiyar bûn.
5. Magî ji perwerdeya keya û

şaxên ku berî derkevin ser text jî berpirsiyar bûn. Pişt re jî şewirdariya keya û şaxan jî dikirin.

6. Magî wê demê astrolog û minecimên herî hunermend bûn. Ji konstelasyona stêrkan pêşeroj dixwendin. Balkêş e ku li gor xristiyanan, ji bo sê qralên pîroz, ku zayîna Hz. Îsa ji stêrkan xwendine re di incilê (*Peymana Nû, Matthäus 2,1–12*) de ifadeya Magoî tê bikaranîn.
7. Magî ji diyarkirina roja newrozê yanî sersalê jî berpirsiyar bûn. Li gor salnameya zerdeştîyê newroz sersal bû. Sal ji 12 mehan pêk dihat û her mehek ji 30 rojan pêk dihat. Loma salek ji 360 rojan pêk dihat. Ji ew pênc rojên mayî re jî “Pênce” dihate gotin.  
Di çend belgeyên Pehlewîyan de tê diyarkirin, ku gel nedizanî ku roja newrozê dihat kîjan rojê. Ew kar, karê magiyan bû. Di roja newrozê de magî derdiketin ser gir û cihên bilind û bi vêxistina êr hatina roja newrozê û sersal diyar dikirin.  
Bi spartina van daneyan em dikarin bibêjin, ku magî di dema berê de xwedî îmajêke pozîtîf,



îtibar û îmtiyaz bûn. Lê ji mînakên li jor hatine dayîn jî em dibînin, ku îro tabloyeke berevajî vê ya negatîf heye. Bibe nebe merî vê pîrsê li xwe dike: Gelo eşîreke ku, yek jî eşîrên sereke ya dewleta Medyayê be, pola rihban ya ola zerdeştîyê pêk bîne, çing û ji ber çî sedemê bû xwedî imaja îro ya negatîf.

Ji nivîskarên hêja yên herêma me Nûh Ateş, di nivîseke xwe ya girêdayî vê mijarê ya di kovara Bîrnebûnê de, îhtimal dide ku ev yek bi dema belavbûna dînê îslamê ya di nav kurdan de girêdayî be.

Ez dikarim piştrast bikim ku di barkirina maneyeke negatîf ya li peyva magî de, ew nîrxandin û tespît faktorekî bingeîn e.

Her wiha divê bê gotin, ku di lîteratura îslamî de ola mecûsî her dem wek cavkaniya hemû xerabîyan hatiye dîtin û destnîşankirin.

Weke tê zanîn, dînê îslamê dînên musewî û îsewî di kategoriya dînên semawî de dinîrxîne û qebûl dike.

Loma li cîh û herêmen ku îslam dibû serdest û desthilatdar, bi miqabilî dayîna cizyê (bacê) hebûna yahûdî û xristiyanan û her

wiha bikaranîna ayîn û wecîbeyên wan yên dînî qebûl dikir.

Lê belê ji ber ku îslamiyetê, dînê zerdeştîyê di kategoriya dînên semawî de qebûl nedikir, ew heq û mafên ku dida yahûdî û xristiyanan nedida zerdeştîyan.

Bi gotineke din, îslamiyetê ji bilî qebûlkirina dînê îslamê ti rêyeke din ji zerdeştîyan re nedihîşt.

Di vê qonaxê de, dixwazim detayeke ku ez girîng dibînim bînim ziman.

Demaku îslamiyetli Îranê bû desthilatdar, zerdeştîyên ku misilmantî qebûl nekiribûn, ku piraniya wan ji magî/mûbidan pêkdihatin, mecbûr man Îranê biterkînin.

Ew zerdeştî, bi 300 keştîyan li ser Derya Ūmanê re derbasî bajarê Mumbayê ya Hîndistanê bûn û li wir bi cîh bûn. Îro jî li der û dora bajarê Mumbayê dora 400.000 zerdeştî dijîn. Ji wan re Zerdeştî û Pars jî tê gotin.

Eger em kome ser hev bikin dikarî bibêjin, sedema barkirina maneyeke negatîf ya civata me li peyva magî, bi nêzîkbûn û barkirina maneyeke negatîf ya dînê îslamê li dînê zerdeştîyê bê dîtin.

## Lur û hur

Di vê navberê de, dixwazim li ser peyva “lur” û “hur” jî çend tiştan bêm.

Ez texmîn dikim, ku di nav wan her sê peyvan de jî xalên hevbeş hene.

Weke peyva “magî”, peyvên “lur” û “hur” jî ji Kurdistanê bêhtir li nav kurdên Anadolê, ji bo ku halekî negatîf îfade bike tê bikaranîn.

Wek mînak: Gava yek hêrs bike dibê “tu yî lurr î çing î ? Ji lafa anlamîş nakî ?”

Yek caran jî “tu yî hurr î çing î” jî tê gotin.

Di vir de divê ez bînim ziman, ku li herêma Anadolê peyva “lur” bi mitabeqat bi maneyeke negatîf tê gotin.

Lê belê peyva “hur” bi qasî ku ez dizanim tenê li gundê me bi maneyeke negatîf tê gotin.

Li gundên cîran yan qet nayê zanîn, ya jî bi maneyeke pozîtîf bi şiklê “hor” tê gotin.

Xala ku bala min kişandî, qet nebe tenê li gundê me Celikan her sê peyv, ji bo ku rewşeke negatîf bê îfadekirin tê gotin.

Ya balkêş ew e, ku her sê peyvan bi dîroka kurdan ve têkiliya xwe hene. Çing ku peyva magî bi bav û kalên kurdan, medan û ola wan zerdeştîyê ve têkiliya xwe heye, îro em dizanin ku dîsa Lurî û Hurî jî ji pêşiyên kurdan in.

Di vê qonaxê de pirsra ku xwe dide der ev e: Va peyvên kevin ku koka wan di dîroka kurdan de veşartîye, j ber ci sedemê li Kurdistanê hatine jibîrkirin, belem li herêma Anatoliya Navîn û li Celikan, bi maneyeke negatîf be jî xwe parastin û hîn jî tên bikaranîn?

Gelo bav û kalên me, bi barkirina maneyeke negatîf li van peyvan xwestin peyamekê bidin desthilatdaran?

Belkî jî xwestin bibêjin; Me êdî têkiliya xwe bi dîroka xwe re birî û em jî êdî mîna we bûn ?

# Çêrokek almanî ji yê n Grîmm

*wergera ji almanî: Nuh Ateş*

## Muzîkvanên Bremenê

**M**erivekî kerekî xwe hebûye. Kerê wî ye ku bi salan bêxem çîwal kişandine aşê wî cîwarî, her diçû bêhal dibûye. Êdî wî ji ber bêhalîyê bi şiya nedikirîye vî karî bike. Xwedîyê wî difikirîye ku yê mê wî bibire. Ker pêhesîyaye ku rewş neçê ye. Wî serê xwe helnaye çûye, dev daye rêya Bremenê. Li wira, wî ji xwebixwe ra digotîye, ew ê bikane bibe muzîkvanê bajêr.

Gava ku bi rê da diçûye ew rastî kûçikekî neçîrê ku li ser rê ketibû, hatiye. Kûçik henav dikutane, mîna ku bibêjî ew ji rêveçûnê westîyabû. „Ma tu çi wengina he-navan dikutî, hemlekê bide xwe?“ Ker jê ra gotîye. „Ax!“ kûçik lêvegerandiye û gotîye, „Çima ku ez î pîr im her roj teqeda min kêmtir dibe û êdî ez nikanim bo neçîrê bi-bezim. Xwedîyê min xwast ku min bikûje! Hîngê min bazda, ez ji wî bidûrketim. De ez ê xêrnedî, aniha bi çi karî nanê xwe qezenc bikim?“ Ker ji wî ra gotîye, „Tu dizanî çawa? Ez diherim Bremenê li wir ez ê bibim muzîkvanê bajêr, tu jî bi

min ra were, tu jî bibe muzîkvanê bajêr. Ez ê lê udê bixim, tu jî lê defê bixe.“ Kûçik pê razî bûye û her du bi hev ra bi rê ketine.

Pir neajotiye, li kenarê rê pisikek bi mirûzekî tahlkirî ketibûye. Ker gotîye, „Ma tu çi bi xwe da ketiyî, rihqusîkar!“ „Ma kî yê şên û şah bibe, eger dest kiribûna qirika wî?“ pisikê lê vegeandiye û daye ser, gotîye: „Çima ku ez ê bi nav salan da diherime, didanê min ê ku/ko dibîne, şûna ku rasere mişkan bidim, ez ê bi hezkirî li paş sobeyê dikevine, xwe ji bîr û şaş dikime. Lewma xwedana min xwast ku min vetisîne. Min ji wira bazda û ez çûm. Lê niha, aqilê baş bi qîmet e, ez bi ku da herim?“ Ker gotîye, „Were, bi me ra here Bremenê, tu ji muzîka şevê rind fehîm dikî, tu dikanî bibî muzîkvanê bajarî Bremenê.“ Pisik dil dike û tev wan dibe.

Her sê revend di hêla çewli-kekê ra derbas bûne. Li ser deriyê hewşê, dîkê malê xwe danabû û bi hêz diqîrîya. „Ev çi qîrînî ye lo! Tu yî guhê merivan kerr dikî, merema



te çi ye?“ ker pirs kiriye. „Mîzgîna heyamê xwaş belav dikim,“ dîk gotiye û wer dewam kiriye: „Ji ber ku, roja jinên me yên bi qedir e, ew ê kirasê zarokê me yê mesîh bişon û zîwa bikin. Lê siwê, roja yekşemî ye, mîvanên bên. Kewanîya malê ya bêmerhemet ji aşpêjê ra gotiye, dilê wê dixwaze ku siwê min

di nav şorbeyê da bixwe. Yanê îro êvarê gerek e ez serîyê xwe bidim jêkirin. Lewma, heta ku min bi şa kiriye, ez ê bi hemû quweta xwe biqîrîm!“ Ker gotiye; „Pêh, ev çi ye sersoro, baştir e tu jî teve me bibe, bibe hevrêyê me. Em diherin Bremenê, tiştêkî ji mirînîyê rindtir tu ê li her derê bibînî! Dengê te rind e,

eger em bi hev ra muzîkê çêbikin, pêwîst e çêşidekî wê hebe.“ Dîk ji pêşnîyarê hez kiriye û her çar bi hev ra bi rê ketine.

Lê wan nedikanîn ku di rojekê da bigihên Bremenê. Devdeve êvarê ew gihêştin daristanekî û xwastin ku şevê li wir derbas bikin. Ker û kûçik li bin dareka gir ketin. Pisik û dîk xwe bi şaxên darê girtin. Dîk firîya ser niçikê jorî darê, dera ku ji bo wî emnî bû. Berî raketine, dîk careke din li çar alîyan mêze kir û li dûrê îşiqek ji wî va xwîya bû. Wî bange hevreyên xwe kir û got, „pir ne li dûrê, ez îşiqekê dibînim, dibe ku ne dûrî vira xanîyek li dera han hebe, ji ber ku îşiq xwîya dibe!“ Ker gotiye, „Gerek e em rabin û herin wê derê, vira şûneke neçê ye!“ Kûçik gotiye, „Bi çend hestîyên ku parçek goşt pêda ye ew ê pê şa bibe!“

Ew radibin û bi rê dikevin, berê xwe didin cîhê ku îşiq lê xwîya dibû. Her ku ew diçûn, îşiq zêde dibû û pir neçû ew gihêştin ber xanîyekî ron yê talankaran. Ker ji ber ku ew bi bejinê yê dirêjtir bû, nêzikî pencereyê bû û li hundirê malê mêz kir. „Tu çî dibînî kerboz“ dîk pirs kir. „Ez çî dibînim?“ ker bersiv da û got, „maseyeke ji xwarin û vex-

warinên xwaş û tewrende dagirtî û li dora wê talankar rûniştine û ew ê tamê ji viderdixine, kêf dikine!“ „Tam li gor me ye,“ dîk got. „Erê erê, ax, xwazika em li wir, li şûna wan bûyîna!“ ker got. Heywan dişêwirin ka ew ê çawa bikin ku talankaran biqewitînin derva. Li dawîyê wan çareyek dîtîn.

Li gor şêwirîn û lihevkirinê, ker lingên xwe yên pêşîyê dayn-an ser pencereyê. Kûçik bazda ser piştê kerê. Pisik helkişîya ser piştê kûçik. Dîk firî û çû li ser serîyê pisikê danîşt. Wexta ku ev kara teva bû bi şûnda, wan bi hev ra li gor şîmarê, dest bi muzîka xwe kirin. Ker zirî! Kûçik lêket! Pisikê kire fişûnî! Dîk qîrî! û di pey va gîşt tevhev di pencereyê ra ketin odeyê û pê ra bû tepûrepa wan, teqûreq û seqûşîqa pencere û caman. Ji ber vê qîrewîr û hayhoyên ecêb talankar bi lez rabûn ser pêyan, mîna ku bibêjî heyaletê ketibû hundir û wan bi tirseke mezin bazdan û çûn nav daristanê.

Her çar muzîkvan li dor maseyê civîyan û li gor dilxwazîya xwe xwarina ku mayî xwarin. Gava ku xwarin bi dawî kirin çire vemirandin û her yekî ji xwe ra li gor taybetmendî û rehetîya xwe li

cîyêkî raketinê geriyan. Ker xwe li ser zibil dirêj kir, kûçik li paş dêrî ket, pisikê xwe li hêla xwelîya germ a tandirê dirêj kir, dîk li ser beştê dîkan danîşt. Ji ber rêwîtiya dirêj ew westîyabûn û cîhlê raketin.

Ji nîvê şevê şûnda, talankaran ji dûrve dîtin ku çireya malê vîmirîye û bêdengîyê dagirtibû her derê. Serkêşê wan got, „Gerek em wengina hêsan ji ber wan nerevîyabûna.“ Wî ferman da ku hevkarêkî wan wekî şande here bi ser malê ra mêze bike. Şande çûye û her tişt ji wî va aşt û huskut xuya kiriye. Ew çûye aşxaneyê ku çireyê vêxe. Wî sorikîya çavên pisikê wekî komira sorbûyî hesibandiye û hewek kibrît helnayê û daye ser çavê pisikê sewa ku ew pê vêkeve. Pisik hêrs bû û bazda ser rûyê wî, pencavêt û cirmand. Şande veciniqî, bezîya û xwast ku di derîyê paş ra bi derkeve, lê kûçik yê ku li wê derê ketibû, bazda ser û çîpa wî gez kir. Gava ku

ew li hewşa malê di hêla zibilê ra derbas bû, ker bi lingê paşîyê dîzeka pît pêva da. Dîkê ku bi teperepê ji xewê rabûbû û hatibû xwe, li ser beştê kire, “Qîrîqîrîqî!”

Şandeyê talankaran bi lezûbez revîya çû ba serkêşê xwe û ji wî ra got: „Ax, di malê da cazûyeke tirsehêz rûniştibû. Ew beriste min û bi tilîyên xwe yên dirêj serûçavên min cirmandin. Ê li ber dêrî merivekî destbikêr dawestibû, wî kêr di ranê min ra kir. Li hewşa malê mehluqatekî reş û girûgerîya hebû, wî bi kutekekê ez hêngaftim. Ê li jor, li ser banê hakîm rûniştibû. Wî bang kir, got: „Wî heylazî ji min ra bînin vira!“ Min cîhlê xwe berhev kir û çiv da!“

Ji hîngê pê va, talankar êdî nediwêrîn ku nêzikî malê bibin. Her çar muzîkvanên Bremenê ji malê hez kirin û nedixwastin ku wê biterikînin.



# PÊKENOK:

## Hızır Akbîna

Li demekê dadgerek tayînî dadgeha Haymaneyê kiribûn. Yekî qaydeperest û destgiran bû. Çi doz û dosya dihatin ber vî aravtarav dikir biryara xwe pir dereng dida.

Xelkê Haymaneyê mexdûr dibû û ji ber vî dadgerî pîştê xwe didirandin. Gotin; em ê jê re çarekê bibînin. Di qahvexanekê de civîyan û gotin; “Ji heqe vî biderkeve ancax Şano ê derkeve.”

Şano yekî şarlantan (çaçûl) û bêtirs bû. Şerm nedikir. Du kes çûn Şano girtin anîn ber civatê. Di civatê de çend kesan şor girtin û ji Şano re qala pirs zorbazîyên dozger êşkere kirin. Gotin; “Birayê Şano ji boyî vî dozgerî tê ji me re çareyekê mezekî! Te çi xwast em ê bidin te.”

Civatê dizanî ku Şano bêpere jî vî karî nake. Şano got;

“Hûn ê ji min re du hespan û erebeka Afyonê (mersedesa wê demê) bikin.”

Cimatê qebûl kir.

Dora dinê rojê erebeyeka nû bi hespên wî va kire ling ling... anîn teslîmî Şano kirin. Şano got; “Hûn belav bin, edî ew kar li min...”

Şano tûrê hespan heyne bezîya dadgehê (edlîyê) û kete hundirê mehkemê û bi hêrs got;

“Hakîm atlarım aç! Arpa-saman kaç lîra bête bête arpa-saman kaç lîra?” (Dozger hespên min birçî ne! Bûhayê cêh û kayê çiqes e, de bête bête cêh û ka bi çi ye?)

Leşker bi lez hatin Şano girtin û avêtin derva.

Cûyîna Şeno ya mehkemê li Haymaneyê belav bû. Edî dozger li ku didîtin digotin; “Hakîmee arpa-saman kaç lîra?”

Zarok dişandin ber mala dozger û zarokan bang dikirin; “Hakîmee arpa-saman kaç lîra?”

Dema dozger ew gotina dibîst serê xwe dikire ber xwe diçû. Lê edî hizûra xwe jî nemabû.

Şano, kê pê ka û ceh gerek bû dişand edlîyê digot; “Li cem dozger Latif ka û ceh pir erzan e. Yê saf û dilpak diçûn pirs dikirin. Dozger mêze kir edî tama wira nemaye çû tayîna xwe xast û çû Ankarê.

Rûhê te şad be Şanoyê şêxbizinî, tu li vê demê pir gerek î, bê ez î va me û were piştbazîyê bike!

## Quto

bayî berbangê  
kilamên xwe yên xweş in  
dengê biharê

havînê navandê rojê  
a giran be  
sîhê darên genim

mirovê ku di dû otobûsê  
dimeşî xuş bû  
qirik li darê danişt

berfin kenîya  
ewran vekir  
dengê zarokan

dengên leglegan  
gund hişyar kirin  
kûçikê lingşewitî

giregirê rûniştina  
tebeqê tutinê xuşa ber hevdu dikine  
li derva dengê kûçikan

roj hilat  
roj çû ava  
pişta xwe li dîwar

baranê biharê  
kevir lût kirin  
newalê

yekê gulanê  
xopana koronê  
kuç û kolan ê vala ne

**Seyfi Doğan**

## Çend gotin û peyv

Kitêba Nuh Ateş a bi navî *Tayek Por*,  
weşanxana APECê, Stockholm 2012  
bû îlhama van gotin û peyv. Nuhê û  
min, ew gotin û peyv tevda nivîsandin.

**Seyfi Doğan**

bêhndirî  
çînavîz  
çîn jê kozkirin  
xwe pankirîyê  
firîskî  
çîn û çortan  
qilot bûyê  
tangûtungê  
fîskand  
devûrûyê xwe da  
duv da nav lingan  
hêstirka tînê xarê  
kot  
qurim  
şoreka bêcîh û bêwar  
destûpîyên xwe li hev piçikin  
bi binî herdê dizanê  
kûçikê lingşewitî  
xizanî û nezanî kêşkê hev in  
ji xema dilan re  
ji qehira keta bin bara  
keçelexi bi qelmusk  
kelekî di dev helnê  
mîna kelekî ku keran cûye  
xizanan bi halî xwe bizanîya riza  
bixwarana  
kêça diqusînê







## Sê berhemên nu ji nivîskarên Anatoliya Navîn

Ev kitêb ji nivîs û gotarên Nebî Kesen pêk tê. Nivîs bi zimanî kurdî, almanî û tirkî ne. Nivîsên di vê berhemê de di kitêbên wî yên çapbûyî de belav nebûne. Lê hinek ji van nivîsan di gelek kovar û rojnameyan de belav bûne. Û gelek ji van jî qet li derekê belav nebûne, wek nimûne helbestên wî. Lê weke defter û destxet li ser parçexaxizan parastî mane.

Li ser daxwaza malbat û birayê wî Îsa Kesen, me jî xwest weke Weşanxaneya Apecê em van nivîsên wî bi navê *Nivîsên Nebî Kesen Toplu Yazıları* di kitêbekê de bicivînin ser hev û biweşînin.




*Paşila Şevan* kitêba Xizan Şilan a helbestan e, ji 38 helbestan pêk tê. Ev berhema wî ya pêncan e. Xizan derveyî helbestan kitêbeka novelê jî weşandiye. Ev kitêb jî aliyê weşanxaneya Ar (*Ar Yayınları*) ve hatiye weşandin.



*Evîn û tolhildana Çoko* serpêhatîya Çoko ye. Şoreş Reşî agahdariyên li ser vê bûyerê jî malbata Çoko, ji malê Ecêlî Bîlalê Elî û ji malê Lawikan jî Reşoyê Keko wergirtiye. Ev kitêb jî aliyê weşanên J&J ve hatiye weşandin.

# Kitêbên dersa zimanê kurmacî ji weşanxana APECê



ISBN: 978-88333-48-3 **Gilok** är en läromedel i nordkurdiskans för modersmålsundervisning i grundskolan. 80 sidor, 150:-



978-91-88333-62-9 **Gilok pirtûka min a ebatê**, en övningsbok till boken **Gilok**, läromedel i nordkurdiskans för modersmålsundervisning i grundskolan, 56 sidor pris 140:-



ISBN: 978-88333-43-8 **Xwezî ez kûviyek bama û ne kivi** dikt för barn av Mueyed Tayip, illustrationer av Necmeddin Biri med latinska alfabetet, 90:-



ISBN: 978-88333-46-9 **Xwezî ez kûviyek bama û ne kivi** dikt för barn av Mueyed Tayip, illustrationer av Necmeddin Biri, 20 sidor, med arabiska alfabetet, Behdinani 90:-




ISBN: 978-91-88333-49-0 **Herfên alfabe ya min**, övningsbok, nordkurdiska, av Mustafa Uzun, illustrationer av Wolf Dieter Köpfer, 72 sidor, 120:-

Ev pirtûk ji bo fêrbûna hin herfên alfabe ya kurdi hatiye amadekirin. Di alfabe ya kurdi de hin herf hene ku ji aliyê formê ve nêzi hev in lê dengên wan cuda ne. Weki herfên s - ş, c - ç, i - î ûwd. Hin herf ji hene ku ji aliyê deng ve nêzi hev in lê formên wan ji hev cuda ne. Weki herfên f-v-w ûwd.




ISBN: 978-91-88333-50-6 **Edebiyata kurdi - pirtûka dersê** bêhtir ji bo xwendekarên liseyê hatiye amadekirin. Giraniya vê pirtûkê bi kurdi li ser diroka ziman, klasîkên kurdi, ekola Hawarê, edebiyata modern û folklorê kurdi ye. *Litteraturhistoria, en lärobok för gymnasieelever på kurmandji*, 226 sidor, 200:-




ISBN: 978-88333-44-5 **Efsaneya werzan** dikt för barn av Mueyed Tayip, illustrationer av Necmeddin Biri, med latinska alfabetet, 90:-




ISBN: 978-88333-47-8 **Efsaneya werzan** dikt för barn av Mueyed Tayip, illustrationer av Necmeddin Biri, 20 sidor, med arabiska alfabetet, Behdinani 90:-



ISBN: 91-89675-03-7 **Alfabe**, 104 sidor, 120:-




ISBN: 978-91-86139-89-6 **Kurdi**, 1-3, 64 sidor, 150:-



ISBN: 978-91-88333-16-2 **Behdinani**, 104 sidor, 120:-



ISBN: 978-91-88333-02-5 **Nordkurdiska**, 104 sidor, 120:-



ISBN: 978-91-88333-14-8 **Nivîsên xwendekaran** - ji dersên kurdi - (Elevtexter från kurdiskundervisning) Nordkurdiska, 246 sidor, 200:-



Gundê Tabura ©Bekir Dari

[www.birnebun.eu](http://www.birnebun.eu)